Gundê Başemrê, girdayî navçeya Şêrewa ya herêma Efrînê ye, li ser çîyayê Lêlûn hatiye avakirin. Ev gund dikeve sînorê bajarê Efrîn û Helebê, 35 km li başûrê bajarê Efrînê û 25 km li bakurê bajarê Helebê dikev.

Gelek gund li navçeya Şêrewa bi weteya (bê ango ba) hatine binavkirin,

Taya mirinê gava ku nêz dibe, hemû hêviyên ku di dilê mirov de mayî derdixîne pêşberî wan, da ku hêvîyên piştî mirina wan bên pêkanîn û xewjîna wan bi cih bibe, ji ber vê yekê roman jî eyn taya mirinê ye, ango di zûtirîn dem de nayê nivîsandin, lê gava ku der tê bi kûrahî tê neqişandin, bêyî ku qelsbûn tê de bê eşkere kirin.

Her wiha pirî caran mirov hewl dide ku serpêhatîyeke xwe ji bîr bike, lê çendî hewl dide ewqas ew bîranîn ji bala wê/î dernakeve û tim wek siya wan bi wan re dibe hevrê, tersî vê yekê jî carcaran mirov naxwaze ku serbihurîyeke xwe ji bîr bike û dîsa jî nikare pêşî li vê yekê bigire. Lê belê tekane rêka rizgarkirina ji vê rewşê bi rêya romanê gengaz dibe û ew dikare her tiştî di hinava xwe de werbigire û bihewîne.

Roman bi danasîna xwe re wek hêvîya derxistina ramanekê tê pejirandin, ew mîzanpaja her tiştî wekhev dike, bêyî ku tu cudahîyê tê de bide sazkirin, di her nirxandineke xwe de bandoreke asayî çêdike û mîrata dewlemendîya xwe bi şêweyekî efsanî dike cihê balkişandinê. Heya ku mirov karibe romanê bi xweşikî bide zanîn, divê ku bi hişkî bi ser de neçe û tengezarîyê lê nede pejirandin û berovajî wê yekê divê ku bi wijdanî, dilovanî û aramîyê pê re bibe yek û li gor hestekî nazenîn ber bi hûrgiliyên wê ve biçe, da ku karibe heyîneke pîroz di hebûna xwe ya li ser rûerdê de qezenc bike, ku ew jî roman bi xwe ye.

Lewre, divê ku her tirsa me ji jîyanê ne mirin be, lê belê piştî xatirxwestinê bila vejandina ruhê me be.…

Ji ber vê yekê jî roman dikare her me zindî bihêle, heger ku em bixwazin vê yekê di pratîkê de pêk bînin û di nava nifşên siberojê de nebin bermahîyên çekirinê, divê ku em xeyala romanê bighînin serî.

Her wiha gava em di nava gelê kurd de qala romanê bikin, yekser tê bîra wan ku romana kurdî ji aliyê binyad û sazûmanîya xwe de cihê rêzdarîyê ye û ew xweşî û reşîya jîyanê bi giştî li gor hûnandina xwe dide ravekirin.

Belê, dibe ku em di der barê girînîya romanê de kêm derketibin jî, lê belê di bîr û bawerîya min de ew e ku roman mirov dixe nav hevsengî, mukimkirina aqil, nemabûna xwecihîyê û lojîkê. li beramberî zagonên dij hişmendîyê bi rijdeke mezin ew dikare bê dudilî rawestе, ji ber ku di navgînîya romanê de gelek sedem û taybetmendîyên buhane hene û ji bilî aqilê dahûrandinî, tu lebat nikare ji wan heyînan fêm bike.

Lewra her û her dirûşmeya min di derbarê romanê de, ev e: Jîyan roman e, em jî romannivîsên wê ne..

pêk tê. Ji ber ku çi hest û engaştên ku di hola mejî de hatibin veşartin, roman wê yekê bi rengê xwe derdixe û li ber çavan radixe.

Her wiha ew enerjîya derxistina hêz û vîna mirov a derûnî û pîskolojî ye, zimanê qêrîna dilê tewandî ye, hejandina prensîpa demê ya nîvçomayî ye, nihêrandina aşopîyên veşartî ye û bê guman ew dimîne karîna pêkanîna afirînerîyê ye. Roman dikare gelek bûyeran an jî kesayetan di hundirê xwe de bihewîne, ji ber ku ew têgîneke wêjeyî ye, tê wateya çîroka bûyera rastîn an jî nîgaşeya pexşanî. Wekî cureyeke wêjeyî, pênase û watedayîna romanê, ne tiştekî hêsan e.

Lewre, roman jî mîna hemû cureyên wêjeyê, wate û raveya wê li gor dem û rêbazên wêjeyî yan jî hunermendên demê, tê guhertin. Li gor dîroka wêjeyê û romana Cîhanî, roman çîrok û dirêj e, ew çîrokeke mîna zincîrê ye û bûyerên rastîyê tên veqetandin û hûnandin.

Gelek vedîtinên ku di serdema heyî de tên dîtin, alozî û pirsgirêkên ku tên ravekirin, encamên ku ji xebateke dûr û dirêj tên derxistin û çendanîya pêkanîna hesretan, bi giştî bi rêya wêjeyê tên vegotin û bi taybetî jî bi rêya romanê, mîna hêmaneke sembolîk her bûyerek an jî serpêhatîyek tê çesipandin û dikeve nava merîyeta ronakbîriyê.

Di heman demê de hêvîya romanê di derbirîna tabloyekê de nayê girtin û di çarçoveyek teng de jî namîne, ji ber ku ew her gav li pey kûrahîya jîyanê dikeve û xwe di cihekî de asteng nahêle, bê navber li pey rastî û dirustîya pêşeroj û paşerojê dikeve, zihnîyeta aqilê mirov berfirehtir dike, dîrokê ji nû ve ronîdar dike û hêvîyekê li pey hêvîyekê zindîtir dike.

Zemîna deranîna derxistina hizir çiqas teng dibe bila bibe, lê ya girîng ew e ku divê roman neyê biçûkkirin û bi qelsbûnê re rûbirû nemîne, ji ber ku tiştekî ne layîqê romanê ye. Ji bilî xweşikbûn û xemlandina ramanan, Dibe ku roman heqîqetê berovajî bike, lê belê di cewhera xwe de ew nayê tune kirin, ji ber em bi rêya romanê her dikarin bîrdanka xwe bi nivîsandin û hûnandinê têr û tije bikin.

Mirov dikare romanê bi her derfetê destnîşan bike, kêlîyên şadî û xweşîyên xwe berhemdar bike, û dikare her demê vemirîne û ziwa bike jî, da ku hêvîyekê bi tenê raxîne ber çavên mirov ku ew jî heqîqeta veşartî yan jî ya heyî ye.Bi her tîpeke tenik, her peyveke nazik û her hevokeke hestdar re, şanazîya jîna azad û afrîner, diyar dike. Her wisa bi serperiştîya derhênerîya nivîsandina romanan re xewnjîn jî tên pêk anîn û dibe ku roman bi qasî lêhûrbûna xwe, xewnan jî nede fetisandin û bin pê neke, lê di der mafê rastîya romanê de binpêkirin nayê qezenckirin.

Romannasî

Roman bi danasîna xwe re wek hêvîya derxistina ramanekê tê pejirandin, ew mîzanpaja her tiştî wekhev dike, bêyî ku tu cudahîyê tê de bide sazkirin

Lîlav Îsa

Ruhê romanê bi hestdarîyê tê vejandin û wek tenêtîya heyvê, ew ronahîya xwe di şevên tarî de diweşîne û reştarîya jîyanê bi hêvîyên kûr ji hola mejî der tîne…

Roman di cewherê xwe de wêjeyeke pexşanî ye, bi dahûrandin û analîzên mejî re dikeve nava qada wêjeyê, ew parçeyeke ji çand û kelepûra mirovahîyê û bi xwezaya deranîna xwe re jî dibe cihê meraqbûyînê. Roman bi gelek şêweyan tê destnîşankirin û ji alîyê xwezaya xwe ve jî ji gelek cureyan

Û ruhê mine kitêba dewra,
Min ew nivîsiye bi xûn, bi agir,
Û bi qelema birûskê ewra.
Ez hatime xar ji çiyayê hêşîn
Ku bengîne tim ji nûra erşa,
Ku ser sîngê wan çem dikin xuşîn,
Şev û roj distrên û kubar û şa...

Ez hatime xar çîyayê ser gijik,
Ku por vediçirin bi şeê tevê,
Ku refê ewra notilî qijik
Ser wan çerx didin tim nava hewê.

Û ez bîr nakim eslê xweyî çîyayî,
Tim mînanî çîya ez zor im, kubar,
Eger min derd bin, eger min şayî,
Û çiqas min xin birûskê cebar...

Şiko ji Elegezê hez dikir, ji ber ku li Elegezê di zaroktîya xwe de dibistana navîn xwendibû. Ew hezkarê çîya, banî û jîyana Kurdan e. Li Leningradê di sala 1967an de bi eşqeke mezin helbesta xwe ya Elegezê dinivîse:

Hemêz kirin pencê royê
Elegeza kaw û naz,
Wê çev mizdan, rabû xewê,
Wergirt xemla xwe ye xas.
Kubar hûna zilf û gulî
Mîna zerya dewatê,
Muhbet gur kir hezar dilî
Evd û îsan, tebyetê...

Konê kurdî li sîngê wê
Bûne hezar xal û xet,
Hezar-hezar war bingê wê
Bûne rewşa xewn, qudret...

Heta mirina Şiko sê heb pirtûkên wî çap dibin. Di sala 1961ê de pirtûka Qalçîçek, di sala 1966an de pirtûka Tembûra Kurda, herî dawî di sala 1970î de Meremê Dilê Kurd.

Piştî mirina Şikoyê Hesen bi navê "Perwaza Welat" û "Payîz û Ba" du heb pirtûkên wî çap dibin.

Ez çiqas qala wî şairê zimanhez, helbestvez, fîdekar û jêhatî bikim dilê min diêşe.

Mixabin Kurdên me qedr û qîmeta nivîskarên xwe nizanin. Kurdên me ji xelkê re yar in ji xwe re korr û lal û kerr in.

Dixwazim nivîsa xwe bi helbesta wî ya Klama Çivîka Zivistanê biqedînim. Ev helbest di sala 1965an de li Tilbîsê hatiye nivîsandin.

Adarê bê, baharê bê,
Wê bên rojêd ezmançîk,
Roj bikene wê eşq, hubê
Daxe pencê zêrkilçîk...
Ku tune bim ez li dinê
Min xem nîne û talaş,
Dinê bi gul bibe xinê
Û bextê xwe bimîn şaş...

Hêvî dikim ku Şikoyê Hesen di dîrokê de weke rûpeleke kevn û veşartî neyê jibîrkirin û di nava nifşên nû de bê zanîn û xwendin.

Şiko de bûne xwedî agahî. Mixabin di destê tukesî derheqê vî şairê dildar de agahî û zanînên berfireh tune ne.

Ka bifikirin Şiko demekê mamostetîyê dike li Radyoya Kurdî û Rêya Teze dixebite, bi piştgirî û derfetên dewletê dixwîne, doktoraya xwe dike. Gelo çiqas rast e ku merivekî wiha pir derfet dîtiye bi sedema feqîrtîyê xwe bikuje. Mixabin ew teorîya feqîrîyê ne rasteqîn e. Jixwe dewleta Sovyetê dewleteke kedkar û karkeran bû. Pergala wan serdestîya karkeran diparêze. Dewlet ji herkesî re li gor qanûnên xwe karekî peyda dikir, ku ji alîyê ekonomîk ve bindest nebin. Di gundan de mirovên heyî li kolhozan, di navçe û bajaran de di komûn an jî Sovyetên heyî de dixebitin. Li gor îstatîstikên di navbera 1955 û 1970î de rêjeya bêkarîyê ji sedî 2 ye. Xelkê Sovyetê bi giştî jixwe feqîr bûn. Ev nayê vê wateyê ku merivê feqîr be xwe dikuje.

Eşkere ye, divê lêkolînerên kurd li ser jîyana wî xebateke kûr û xurt bikin da ku em jî pê zanibin Şiko kî ye, çawa jîyaye, çi xebat kiriye, di jîyana xwe ya rojane de çi êş, derd û azar kişandine û herî dawîyê çima xwe kuştiye?.

Lê divê were fêmkirin ku Şiko berî her tiştî mirov e, şair e wekî her şairî bi civatê re li hev nayê tenê ye. Hest û ramanên wî ji herkesî zêdetir dilzîz, dilgerm û dilmayî ne. Rihê Şiko kubar e nazenîn e. Dilê wî herdem di lêgerîneke kûr de ye.

Şiko romantîk e, xwezayê weke evîndara xwe hez dike. Ew paqijî û



■ Şikoyê Hesen

bêgunehîya xwezayê mîna çavên xwe diparêze. Sermest dibe bi ramûsanan, serxweş dibe bi hilman. Di sala 1967an de li Lenîngradê qelema xwe dajo ser peyvan, dilê xwe radixîne ser kaxizan.

Ev barana dûr mîna yara min
Tê û radmûse dêm-dîndara min,
Ez bi eşq dibhêm sed û kêlma wê
Û serxweş dibim bîn û hêlma wê...
Barana ezîz bi eşq tê xarê,
Dinyayê dişo toz û xubarê,
Dinya dikene mîna gula al,
Ji min direvin û xem û xiyal.

Şiko Kurdperwer û welatperwer e, Kurdan wek çîyayekî bilind dibîne. Di sala 1967an de li Tilbîsê di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Ez çîyayê çîya me, ji çîya bilindtir,

Serbest

û bi xwendinê re dubare dubare kêfek mezin hildidim, helbesta Dilê Bengî ye, ku di sala 1963an de li Lenîngradê hatibû nivîsandin. Şiko di vê helbestê de dilê xwe yê birindar û kesergirtî radixîne li ber kewa xwe ya gozel. Evîn û bêrîya dilê xwe yê êşdar, di sîng û berên qerqaş de digere ku xwe aş bike.

Sîng û berê wê yê qerqaş berfa çîyayê Kurdistanê,
Ku nedîtiye evd û îsan di heyamê zivistanê,
Bi huba xwe kewa gozel lê kir kibab dil û ceger,
Hişt birîndar, hişt tengezar û tek da wî kul û keser,
Birîna wî, ax, ya dil e, ne ya şûra û xencera,
Dermanê wê peyda nabe li tu erda, li tu dera.
Heta kewa gozel neyê û dest nede ser birînê,
Birîna wî naaxibe û êşa dil nayê birînê.

Şikoyê Hesen, di sala 1928an de li gundê Camuşvana biçûk ku girêdayî navçeya Axbarana Ermenîstanê ye tê dinyayê. Malbata Şiko piştî şerê cîhanê yê yekemîn ji ber qetliyama dewletê dixwaze xwe xelas bike, mecbûr dimîne ji Dîgora Qersê koçî Ermenîstanê dike. Şiko hê pênc salî ye, bavê wî Hesenê Mido dimire. Apê wî Sofî wî xwedî dike.

Şiko piştî xwendina xwe ya seretayî, navîn û ya dawî di sala 1948an de diçe zanîngeha Yêrîvanê beşa ziman û zanistiyê dixwîne. Bi xelaskirina zanîngehê ve di navbera salên 1954 û 1957an de mamostetîya zimanê Ermenkî dike.

Şiko di beşa kurdî ya radyoya Yêrîvanê de dest bi edîtorîyê dike, û di navbera salên 1959 û 1961ê de jî karê şêwirmendî û wergêrîyê dike. Demekê peywira edîtorîya Radyoya Rewanê dike. Di sala 1961ê de bi sedema perwerdehîyê diçe Leningradê û ser zimannasyê doktoraya xwe dike. Di sala 1965an de di Enstîtuya Gelên Asya û Afrîkayê de beşa Kurdolojîyê temam dike.

Helbestên Şiko cara pêşîn di rojnameya Zanîngehê de û dûre jî di rojnameya Rêya Teze de tên weşandin û car caran jî li radyoya Kurdî tên xwendin. Şiko dibîne ku dewleta Sovyetê pişta Kurdan digire, her derfetê radixîne pêşîya wan, ziman, çand, huner û jîyana Kurdan mezin û bilindtir dike, ji ber vê mebestê herdem dibe alîgirê dewleta Sovyetê.

Şairê dildar, qelemhêz, mirovperwer û hestiyar Şikoyê Hesen di sala 1976an de xwe dikuje, lê hê jî sedema xwekuştina wî ya rasteqîn nayê zanîn. Gora wî li paytexta Gurcistanê ya bajarê Tîflîsê ye.

Mixabin hinek nivîskarên kurd sedema mirina Şiko girêdayî şert û mercên feqîrîye dikin, lê ev teorîya spekulatîf, teorîyeke objektîf nîne. Hûn ê bêjin ku ew canik û camêran di dema Şiko de jîyane û 24 saetan bi Şiko re geriyane. Em hê teze di derbarê jîyana

Dilekî Birîndar Şikoyê Hesen

Şiko romantîk e, xwezayê weke evîndara xwe hez dike. Ew paqijî û bêgunehîya xwezayê mîna çavên xwe diparêze.

Occo Mahabad

Şiko aşiqê ziman, çand, dîrok û milletê xwe ye. Alîgirê yekîtî û tifaqê ye. Hestên neteweyî pê re bilind in. Helbesta "Bi xemil, rewş e
/Şêrîn û xweş e/ Zimanê kurdî…
Beyta Feqî ye /Sewta Xanî ye/ Zimanê kurdî" ku ji alîyê Aram Tîgran û gellek hunermendên din ve hatibûn xwendin, ya Şikoyê Hesen e ku dilê me şa û bextewar dike. Şiko wekî her helbestvanê kurd dildar e û nazik e li ber bûyerên civakî, dixwaze ji birînan re derman bibe. Şiko bi eşq û sewdayê re xwe dike dergeh, perestgeh, ew dilekî birîndar e, bi hesret û kedera yar û warê xwe, peyvên birîndar di dergûşa dilê xwe de kedî û sax dike.

Helbesta wî ya ez jê zehf hez dikim

miletan ên ji hevgirtî û li hev vedayî digere. ya raşt ku weke rêbazê; xwendina navbera wêjeyan de bihata bilêvkirin, ne weke ciwankarî û afrendêrîya wêjeyî.

-Wêjeya cîhanî: Di bingeha xwe de wêjeyeke neteweyî ye, bi rêgezên xwe yên hizirî û hunerî pir zirav e, di hêjabûna xwe de têkldarî pirsên mirovahîyê ye, xwe di ser sînorên neteweyî re derbasî cîhanbûyînê dike.

Rol û girîngîya wêjeyê ji bo civka mirovan:

-Ji hêla gîyanî ve, ji bo dil û gîyan weke hêza sorbûn û sîqalkirinê ye, û Bosleya ji bo berbiraştî û spehîbûnê ve ye, ku bi metiryalên wêjeyê pirensîpê mirovahyê têne avdan.

-Wêje dibe weke samanekî wateyî (manewî) ji bo her nifşekî

-Wêje rewşa jîyana civakê ji pir hêlan de di çawanîya hizirandin, hezkirin û yarmetî û berxwedêrîyan de, bi gewde dike. weke neynikekê ye di dîmendayîna hûrbînî û rabûrîya têklîyên di navbera kesên civakê bi hev re û bi jîngehê re.

-Bi rêka wêjeyê mirov dikare bibe heval û hemsazê kesayetên bejinbilind di wêjevanyê de, ew jî bi rêya xwendina berhemên wan.

- Heger vedîtina ziman baştirîn vedîtine di seranserî dîroka mirovahyê de,wêje xemila ziman bi xwe ye.

Encam

Di encamê de eşkere ye ku wêje, ne tenê çîrok û çîvanokên ku bûyerkê darvedike û belkî were ji bîr kirin, lê belê di jiîyana kes û civakê de xwedan peywireke sereke ye., ji bo lêgerîna raştyê û pênasîna dadmendiyê û vedîtina çaktirîn têklî û peradîgmên guncaw û hejandina dil û mejî ber bi nîgaşmendiyê ve di der barê raza hebûnê de. Ev giringî û nirxên wêjeyê ne tenê di van qonaxan de hatiye nasîn, wek tê pejirandin û li gor pîvanên Yûnana kevin ku helbeşt di pileya pêncemîn ya hunerî de.

1-Avahî
2-Mûzîk
3-Wênesazî
4-Peykersazî
5-Helbeşt
6-Dîlan
7-Sînema, ev huner di serdema nû de bûye hunera heftemîn.

Çavkanî:

-Eriş fîşer,giringiya hinerê-wergerandina Esed Helîm
-Wêjeya nû kurdî
-D:serwet, Ensklopêdya dîroka hinerê,Darelmearif Qahîra.
-Stîvin ar Kovî,Adat elsebiee
-Ocelan hevdîtinên bi rewşenbîran re.

Bêjeya Wêje:

Ereban bi peyva EDEB ev dîyarde binav kirine, li gor zimanê erebî, koka xwe ji vexwendina ji bo xwarinê girtiye, ta weke ezberkirina qesîde û helbetan, di serdema Ebasîyan de û ta roja îro Edeb weke hunera helbest û pexşanê tê bikar anîn.

Peyva wêjeyê li gel Ewrupîyan, bêjeya LITERATURE ya koka wê ji zimanê latînî hatiye, bi wateya Tîp(herf) bikar tê.

Û wêje ji zimanê yûnanî GRAFIK bi wateya zanîna xwendin û nivîsandinê ye.

-Wêje: Weke zarav di serdema nû de li şûna edbîyatê lîteretorê hatiye bikaranîn a ku koka wê ji bêjeya; wişe ji zaravayê soranî hatiye dariştin.

-Hin gotinên di der barê nasîna wêjeyê de ji bal hin kesên navdar:

-Afleton:"xwesteka wêjeyê, pêşî mirov ji nefsa xwe şerm bike"

Şikspîr:"Sê tişt mirovan bilind dikin,,Wêje, Zanist û çakrewiştî".

-Tolistoy:"Hêjaye mirov mehrîban be, ji ber mehrîban, mirovan tîne gel hev, û divê mirov wêjevan be, ji ber wêjevanî, dilên ji hev xeyidî dike yek".

Nansî Hîostin: "Wêje, nepejirandina cîhana heyî ye.."

Gabriel Markes:"Dema mirov li bedewtrîn otombîlan siwar bibin û wêje di kemyonên baran de be, wê cîhan li xazoqan keve"

Ehlam Mistexanimî:"ji birînê wêje dizê"

-Ocelan:"jiyana bê huner û wêje, mîna jiyana di asta lawiran de ye"

Wêje û felsefe

Hin alî dibêjin ji hev cuda nabin û piranîya fîlozofan di qonaxa helbestvanîyê re derbas bûne, ji Zerdeşt bigire û heya fîlozofên Yûnana kevin ku kûrahîyeke wan di der barê wêje û hunerê de hebû. li gor Dîkart ku hebûn û heyînê bi felsefeya hizirandinê ve girê dide,"Ez dihizirim, dêmek ez heme"

Li gor wêjevanan bi şêweyekî din hebûna mirovî di çarçoveya felsefeya êşê de rave dikin"Ez diêşim dêmek ez heme".

Wêje ji du hêmanan pêk tê:

-Pexşan: Celebekî ji hunera wêjeyê ye, efsane û çîrokên gelêrî di nava xwe de hildigre û her wiha roman û çîrokên kurt û qesîdeya nûjen jî pê tê hûnandin.

-Helbest: Zehmettirîn celbê wêjeyê ye ji ber ku rêzan û rêgezên wê yên taybet hene.

Beşên wêjeyê:

-Wêjeya neteweyî: Berhemên ji daner û helbestvanên ji netewakê kom dibin, di çarçoveya jîyana neteweyî ya tayebet de hatiye berhevkirin.

-Wêjeya berhevkirî: Zanisteke li têkilî û wekhevîyên navbera wêjyên

Wêje

Wêje rewşa jîyana civakê ji pir hêlan de di çawanîya hizirandin, hezkirin û yarmetî û berxwedêrîyan de, bi gewde dike.

Beşîrê Mele Newaf

Wêje çiye?

pirseke di her serdem û qonaxan de ji bal kesên têklidarî wêje, derûnnasî û bedewnasîyê hatiye lêkolîn kirin. Wêjevan û nivîskarê firansî Jean paul Sarter, hewldanek di vê der barê de kir, lê ew jî di bersivdayîna vê pirsê de bi ser neket, ji sedmên ku wêje bi rewşa civakê re bestîdar e û di hev re derbasbûyîn e, ku dikevin bin guhertin û veguhertinên civakê yên derûnî, aborî, sîyasî, bîrûbawerî û çanda gişti, lewra di her qonax û serdemekê de li gor rewş, têgihiştin û bîrewerîya civakan tê pîvan û pênasekirn.

Di xetên stûr û cewherî de merev dikare bibêje: wêje diyardeyeke mirovahî ye, ji hest, hizir, dilnazî û nîgaşên di pêvajoya ezmûneya jiyana mirovahîyê de li gîyan û hişî vedane. Bi bêjeyan tê hûnandin çi bi devekî çi bi nivîskî, bi şêweyekî rewanbêjî û hunereke zirav tête derbirîn.

û rêziknameyekê ku rol û karê vê sazîyê xurt bike.

Li gorî xala /33/ ji Hevpeymana Civakî ya Rêveberîya Xweserîya Demokratîk, navendê projezagona sazkirina «Sazîya Mezopotamya ya Werger û Weşanê» amade kir.

Di 1ê îlona 2014an de û li gor ferwerên Hevpeymana Civakî ya Rêveberîya Xweserîya Demokratîk ku ji alîyê Encûmena Zagonsaz ve hate erêkirin ku Sazîya Mezopotamya ya Werger û Weşanê were çêkirin, ev navend hat vekirin.

Di despêka xebatên navendê de, giranîya kar ji zivirandina zagon, rêzikname û belgeyên Rêveberîya Xweserîya Demokratîk re bû. Her wiha karmendên navendê alîkar bûn bi kesên bîyan re di dema serdana wan ji herêmên Rêveberîya Xweser re ku xebatên Rêveberîyê bi wan bidin naskirin. Ji alîyekî din ve jî, xebatên kultûrî jî berdewam bûn mîna wergera nivîsên girêdayî herêmên şûnwarîyê li Rojavayê Kurdistanê.

Zimanên wergerê li Navenda Mezopotamyayê kurdî, erebî, siryanî, ingilîzî, fransî bûn. Piranîya zagonên Rêveberîya Xweserîya Demokratîk ji zimanê erebî hatin wergerandin kurdî, fransî û ingilîzî jî. Her wiha belge jî bi zimanê erebî, kurdî û ingilîzî hatin wergerandin.

Ji ber ku yek ji erkên Navenda Mezopotamya yên bingehîn ew bû zivirandina kultûra cîhanî ji zimanê kurdî re da ku pirtûkxaneya kurdî bi van berhemên giranbuha dewlemend bibe, her wiha veguhastina kultûra kurdî ji zimanên din re ye, êdî berîya salekê xebat ji bo destpêkirina projeya wergera roman û pirtûkan ji zimanên curbicur hate kirin, di heman demê de belavkirina kultûra gelên Bakur û Rojhilata Sûrîyê ji tevayî gelên wê û cîhanê re bû. Mixabin êrîşên dewleta Tirk a dagirker û terorîstên girêdayî wê ta demekê bandor li xebatên navendê û projeya wê kir ku proje hat rawestandin. Lê piştre ji nû ve dest bi van xebatan bû. Ta aniha romanek ji zimanê erebî zivirîye zimanê kurdî û hatiye çapkirin li çapxaneya Şilêr a ku alîkar e di vê projeyê de. Ew romana nivîskar Nebîl Milhim «Textê Beqlawayê yê Xemgîn» e. Du pirtûkên bi zimanê erebî tên wergerandin ji zimanê kurdî re, pirtûkek ji ingilîzî tê wergerandin kurdî, du pirtûkên bi zimanê kurdî tên wergerandin ji zimanê erebî re, her wiha pirtûkek amade ye ji çapkirinê re.

Hêvî û armancên navendê û karmendên wê mezin in ku alîkar bin di veguhestina van kultûran de, da ku bibe navgîna pêwendîyan di dema bê de. Her wiha navend hêvîdar e ji her kesê pispor û şareza di hunera wergerê de ku bi navendê re alîkar be û tevlî vê xebata wê ya pîroz bibe ku serkeftinekê di qada wergerê de pevre pêk bînin, li ser asta Rojhilata Navîn û cîhanê tevî.

Gilgamiş ji tabloyên herî kevn bûn ku ji somerî hatine wergerandin zimanê hîtî û hûrî, her wiha Koda Hemurabî ji zimanê akadî zivirîye zimanê hûrî nêzî 1700 B.Z. Jixwe pirtûkên felsefeya yonanî û pirtûkên pîroz jî wergera wan roleke erênî lîst di pêşketina hunera wergerê de, ku her kesî dixwest naveroka van pirtûkan bi zimanê xwe bixwîne û ji wan fêr bibe. Ew jî ne gengaz bû ger zanisteke mîna wergerê tineba.

Di encama pêşketinên heyî yên di çanda gelên cîhanê de ji hemû alîyên ve çi wêjeyî, zanistî û teknîkî jî be, pêwîst bû ji gelê Sûrîyê re di van salên dawî de ku danûstandin digel van kultûran hebin ji hemû alîyan ve, yek ji van alîyên danûstandinan jî ew di rêya wergerandina hizra mirovahîyê ya van welatan ji zimanên gelên Bakurê Sûrîyê re bû. Her wiha weşandin û wergera kultûra van gelan di rêya hevkarîyê bi hemû navendên werger û weşanê yên herêmî û cîhanî re bû. ji bo bicîkirina vê armancê pêwîstî bi karê sazîyan hebû ku bi awayekî zanistî û pispor ev xebat were kirin.

Plan ew bû ku çanda gelan were zivirandin, ku hem ji alîyekî ve gelên herêmê ji ezmûna gelên cîhanê sûd bigirin, hem jî ezmûna Rêveberîya Xweser ji gelên cîhanê re ragihînin. Ji bo vê ramana binirix, pêwîstî bi sazkirina Navenda Mezopotamya ya Wergerê hebû. Ew jî di rêya rewakirina zagoneke taybet

Navenda Mezopotamya Ya Wergerê

Ji ber ku yek ji erkên Navenda Mezopotamya yên bingehîn ew bû zivirandina kultûra cîhanî ji zimanê kurdî re da ku pirtûkxaneya kurdî bi van berhemên giranbuha dewlemend bibe..

Darwîn Darî

Dema em li pêşketinên ku di dîroka mirovahîyê de vedigerin. Zelal e ku hêmaneke bingehîn a alîkar di veguhestina van pêşketinan de werger bi xwe bû. Mînakên vê yekê di dîroka mirovahîyê de li ber çavan hene. Êdî her ku hişmendî û fersenda mirovahîyê bi pêş diket, bêhtir rol û girîngîya wergerê jî dihat naskirin, çi di qada zanistî, aborî, civakî, cografî, leşkerî, olî û polîtîkayê jî de. Li gor vê girîngîyê, werger jî li çarhawîrê cîhanê pêş ket, ku gihaştî asta weke zanistekê lê bê nêrîn. Jixwe ta aniha weke tê naskirin ku Destana

Em xwe pêşxînin erdan biçînin
Deşt û zevîyan tev bixemlînin
Em cotarî ne bi rez zêtûnin
Bav û kalan de ev karê me ye

Xanîyan bigirin kolanan çêkin
Jîyaneke azad nû ve despêkin
Zarok ê kom bin li dor me şênkin
Wê ava bibe ev xewna me ye

Em xwedî vîn in xwe pêşdixînin
Nêzîk dinirin dûr jî dibînin
Ji cih warê me me diqewtînin
Çavên neyaran tim li ser me ye

Me pir ked dayî jê bingeh mayî
Darek kok qaling tamar berdayî
Rovî di bin de bin kêf pal dayî
De ka em biçin rewş awarte ye

Keçê de ka em biçin

Mihemed Welîd

Ji min guhdarke hîn derfet heye
Rabe dereng e va erka te ye
Aheng gumreh e dîlan fere ye
Welat biha ye li hêviya me ye

Welatê xelkê nabe ê mera
Neb zêr û zîvan ne jî bi pera
Xweşik kirine ne ji min û te ra
Em winda dibin veger tun ye

Binêr rojane kurd têne kuştin
Axa em li ser xwînê de hiştin
Em koçber kirin şûn me rûniştin
Ger wisa here nebûna me ye

Em ê kar bikin gavan baş çekin
Pêşerojê re piroja vekin
Can û rihê xwe tê de feda kin
Dîrok dibêje ew mala we ye

Şîndarîya min radixe

Ê ku dinale li wê şevê
Hejmarê berbangan ez im
Êş û keser ma kê divê
Ê ku kedî bûye ez im

Şûvek mi hiştin tevde çûn
Ji kengî de kesî min neçand
Kember li dora min vebûn
Stirîyan xwe wê jî li min kişand

Pirwaz û wêneyên wê demê
Hîn jî bi mijankên min ve ne
Kê guh dida tîna lemê
Ew reh ji zu de li derve ne

Gunhê ewê rêkê çi ye
Her kes ji xwer pêlê dike
A dil revand û bir kî ye
Fîxan ne sax e û jîn dike.

Bi xwezîyan re herdû seridîn
Hest û hêvî kengî mirin
Gava ji buharê xeyidîn

Li nav wan riwan el çi digerim
Kenê ji salan bû beyar
Rojên berê hew vedigerin
Li şûna xwe hiştin êş û ar

Çi bikim xuya nakin birîn
Leyan û havînek ziwa
Li rokê dinerim ma ka nerîn
Tîran diçîne li van riwa

Meyê dinoşim nare êş
Mîna peyalê şkestiye
Her kes dibaze paş û pêş
Hîn pela min rêwî ye

Heya ku min nas kir jîyan
Çi bikim temen borî bi lez
Robar û çemên çikiyan
Tî mane mane rîhan û helez

Bi dilpakîyê re diponijim
Nîne ji çavan re perav
Mîna pizotê diqijqijim
Ev bû jîyana wek zirav

Rawestiyan xewn û xeyal
Di nav payîzê de temirîn
Geş bûn berê mûm û şemal
Ew jî bi çavar vemirîn

Rajê hemû tiştî bibe
Rekeh vebû firîyane çûk
Şaxê şkestî hew şîn dibe
Porê spî kî ma biçûk

Ji ku mane çavên raketî
Ji ber xirecira hestan şîyar
Ji hêsran riwê kê şewitî
Jê têr nebûm kin bû buhar

Êrîş dike bi tîr û kevan
Pûç bûye hîn jî lê dixe
Ji bêrya kê winda bûn civan

Kin Bû Buhar

Fîxan Hîmo

Her roj bi kêlîyan in didît
Ji salê nema kêlîk tenê
Xewn û xwezî bûn der bi der
Ma ka çi maye ji sotinê

Li hêvîya kulan min dest li ba
Ka zê çi bêjim vî dilî
Mîna zarokê şîr diva
Razî nebû li ser vî milî

Qîrîna heyvê tê guha
Ka zê çi bêjim nîne şev
Xwîn û ziwa bûye ji reha
Hêdî ji qidûman bes bikev

Bi hestan dilîzin bê sedem
Bi pişta bîrnav hilkişîn
Her kes dixwaze kin be çem
Tîp û zimanêm qelişîn
Çavên şkestî li rê dirin

Hest û hêvîyan sînorne nas bikin
Pê dilê evîndaran
Ji xeman şîr vekin
Ji parsûyên min û yên helbestê
sîwanekê çêkin
Bila kesên bêwar tê de rawestin
Ji peyvên helbestên min
Destmalekê çêkin
Û serpêşiya govendan pê bigerînin
Xwîna min û ya helbestê
Tevlîhev bikin
Pê nexşeya welatekî azad
çêbikin
Û di wî welatî de
Ji
Hev
Hez
Bikin
Ji hev hez bikin .....

Xwîna Helbestê



Mehmûd Misto

Helbest

Xwîna min û ya helbestê
Tevlîhev bikin
Bila kevokên baskokirî jê vexwin
Û di asoyên bêtixûb de
her û her bifirin
Bila ewrên tarî
jê têr vewxin têêêr
Û rûreşîya xwe pê bişon
Bila gulên ji tîbûna re serê xwe
danî ser çonga zinaran
jê vexwin
Û kosteka buharan biqetînin
Xwîna helbestê û ya min
Tevlîhev bikin
bikin lêmişt û lehî
Û pê talana gulîyên Edûlan
vegerînin
Pê....

Çerxa felek

Mihemed Abdulezîz

Çerxa felek rast badidim
Şêrên çîya serbaz didim
Gulîstana xwe av didim
Şûna avê xwînê didim

Çerxa felek ger bo me ye
Yeqîn ev dem dema me ye
Cîhan têkde bê ser me ye
Kurdistana xwe hew didim

Enîya Botan giha stêra
Simko kendal eva şêra
Next vebirîn;b.xwîna mêra
Çendî divê hêjî bidim

Kanî Reşîd kanî Dijwar
Kanî Ehmed kanî Zinar
Kanî Mihyedînê serdar
Soz be li min hêjî bidim

Kanî Harûn kanî Sozdar
Kanî Ceger kanî Sozdar
Canê şêrîn kirin diyar
Li pey we bêm sozê didim



nedibişkivîn û dimirin.

Qeyî barana îşev dibare dixwaze te av bide? Tu, gula ku min îşev te binax kir? Rûyê te dide pey min. Ji destên xwe nefret dikim...

Difikirim îşev her du destên xwe jê bikim, wan jî di bin gora te de binax bikim.

Min bi sedan mirovên kal, pîr û zarokên nîvçe...li vê goristanê binax kirin, di navbera min û mirîyan de tenê dîwarek heye, karê min ev e, ez gorkolerim, min bisedan rû binax kirine, lê nizanim çima rûyê te tenê dide dûv min û ew gulîya te ya hûnandî ji ber çavên min naçe.

Çend kesan li ser kevirê gora te li şûna nivîsê stêrkek di nava sêgoşeyekê de xêz kirin, carinan tê hişê min ku tu berê stêrkek bûyî, lewma ronî ji rûyê te dibare.

Min stêrkek binax kir, stêrkeke bê nav, ez ji xwe re dibêjim, min mêjiyê xwe xwariye, nizanim çima dihesim ku esman merasîma pêşwazîya stêrka xwe dike, di bin çavan re bi dizî li derve li goristanê dinêrim, ka hîna gora stêrkê li şûna xwe ye?.

Dema ku brûskan lê dida di nava hemû goran de gora stêrkê diçirisî, min xeyal dikir ku tu yê niha ji bin wê axê derkevî û ber ve esman ve bifirî. Canê min gurzgurzî dibû, mûyên laşê min disekinîn...

Nizanim çawa bû sibeh û pê re baran rawestiya, çavên min xwe berdabûn kortên rûyê min û bin çavên min reş bûbûn, serê min gêjûmêjo bûbû, tevî ewqas westiya bûm, nizanim çima min dixwest herim ser gora stêrkê, lingên min tembel tembel li peyî min dimeşiyan. Beriya ez bigihêjim ser wê gorê min dît xortekî bejin zirav xwe gihand ser gorê. Ez ê vegeriyama, dudilî bûm, lê meraqê ez gihandim ber gorê.

Min silav li xort kir, wî jî li min vegerand, zimanê wî nedişibîya zimanê vî welatî. Pirsan serê min gêj kir, mêjiyê min diçelqiya, dilê min jî dikir vereşiya û volkana peyvan li ser vî xortî de biteqanda, lê min xwe girt û hemû meraqa xwe daqurtand, ji tirsa ku bifikirin ez dîn bûme û ji min bawer nekin.

Min haya ji xwe tune bû ku rûyê min tirş bûbû û wek ku ez xwediyê mirî me, ne ew xortê li ber gorê ye. Dema xort rûyê min dît çavên wî tijî hêsir bûn û ber dilê min bela kir, destê xwe li milê min xist û got:

-Ew namire, di dilê me de dijî.

Min ji gotinên wî tiştek fam nekir, ji berîka xwe stêrkeke biçûk nav sêgoşeyekê de derxist û bi sînga min ve daleqand, careke din destê xwe li milê min xist, keserek kûr kûr kişand, li gorê nihêrî û got:

-Ez ê biçim, li hevala min miqayit be, ew di xeweke kûr de ye, heger şîyar bû jê re bibêje: Çeka te li milê hevalê te ye tu rehet raze.

Xort ji goristanê derket û çû, ez jî li ber stêrka razayî matmayî hişk mam. Cara yekemîn bû di jîyana min de ku ez stêrkekê binax dikim, binaxkirina vê stêrkê mêjîyê min yê ku hemû jîyana xwe razayî bû hişîyar kir, cara yekemîn bû min meraq dikir, gelo li derveyî vê goristanê çi diqewime??!.

Gorkoler

Binaxkirina vê stêrkê mêjîyê min yê ku hemû jîyana xwe razayî bû hişîyar kir, cara yekemîn bû min meraq dikir, gelo li derveyî vê goristanê çi diqewime??!.

Zîlan Hemo

Dengê dilopên avê diniqutî guhên min, dilop dilop tirseke wek rûyê min ê miçiqî xwe ber dida hundirê min.

Cara yekê ye ez ji barana vî bajarî ditirsim, tevî ku hîna ewrên wê weke berê çavteng in û hêsirên xwe zûbizû nabarînin. Lêvên vî welatî terikandine.

Îşev dilê min nahewe di sînga min de, dengê birûsk û tavan olan didin. Berîya ku baran erdê şil bike, xwêdana min livînên min şil û pil kirin.

Dixwazim rakevim, westîya me, lê her ku xilmaş dibim brûsk min diveçniqînin, her ku çavên xwe digirim rûyê te tê ber çavên min, gunehên min didin dûv min û ez bi lingine xwas ji wan direvim, her ku li pişt xwe dinêrim rûyê te yê nazik û destê xwe yê girs û kulmek axa ku rûyê te vedişart, dibînim.

Ji berê de min çiqas dixwest gulan biçînim, min nikarîbû, her ku min gulek diçand, diçilmisî, hişk dibû û dimir. Ji min re digotin destên te ne bi xêr in, min ji destên xwe yên gulan binax dike nefret dikir, destên min man bi hesreta ku guleke wan bin ax kiribûn, bibişkive,

nikarîbû bala wê kişandiba, bi hestekî şkestî dida dûv gavên xwe yên pîvayî, û ew kesên ku di ber wê re dibuhirîn, wê rojê gişî stuyê wan diêşîya.

Çenteyê li milê wê hejîya, destê xwe xist hundirê wê, telefon derdixist, li nav dinerî û qut dikir, û dema ku çavên wê li demjimêrê diket dihate bîra wê çaxa ku dêya wê radibû limêja sibehê dikir bêyî ku zanîbe demjimêr çi ye!

"Gelo ma ne divê laş jî serbest be wekû hundirê mirov! Mîna birayên min bi kêmanî, çima wê serbestîya vî laşî tim li pêşîya kesekî tenê be, û pirrê caran jî belkî ne ew kesê ku mero wî dixwaze (ta ku laş bê firotin jî ti carî hundirê mirov kes nikare wî derxîne ger ew nexwaze). bila hûn xweş zanîbin, Hewwa, qet ne serbest bû, kes ji bilî Adem tune bû".

Telefona xwe vedigerand çanteyê xwe, bêyî ku li hawîrdora xwe binêre derbasî derîyekî dibû, bi pêlikê ve hildikşîya.

Li alîyê din ê cadeyê du xityaran berê xwe dabûn hev li pêşîya dikanekê, ku sêribê wê vala bû, bi damayê dilîstin û carê yekî ji wan kîsê tûtina xwe derdixist û bi wan destên qermiçî çixare dipêçandin, pirrê caran jî silav venedigerandin, pirr mijûl bûbûn bi lîstikê ve.

Dengek şipya dihat:

-Ma kî ji we biserketîye loo.

-Ez...ez, Hecî xwe li pêşîya min nagire ew jî nema tiştekî ji hev derdixe.

Radihişt kevir û kertona xwe, Hecî berê xwe dida xanîyê li hemberî wan û bi dengekî qebe digot:

-Kiro qey vî îro ew gulên di pencereyê de av nedaye.

Hecî jî nizanîbû ku bêhna pencereyê çikyabû, tev li wilo jî wê fedî dikir ku peredeya xwe dawerivandaba, ji ber ku her tişt bi beloqî çavdêrya laşê wê dikirin.

Herdu dest bi hevûdin ve girêda bû û tûj xistibû navbera herdu kabokên xwe, ji bilî bêhnvedana xwe dengê tiştekî din nedikir, tevzînok weke derzîyan ji binê pêyên wê ve hêdî hêdî bilind dibûn û li ber çena wê xwe di xew re dibirin.

Bisk xwe bi ser guhên wê de berda bûn û çend mûyên porên wê li ser dêman şil bûbûn, ji nişka ve teperepa dil ji dengê bêhnvedanê xurtir dibû, mîna darekê di payîzîyê de şipya dibû û hêdî hêdî ji odeyê derdiket; çavên tiştan sist dibûn, ode jî herdu tilî ji ser pozê xwe hiltanî û xwe dawdişand.

Erê Ez Bûm

Bisk xwe bi ser guhên wê de berda bûn û çend mûyên porên wê li ser dêman şil bûbûn, ji nişka ve teperepa dil ji dengê bêhnvedanê xurtir dibû..

Xoşman Qado

Bêhna te çima wilo teng e, ma çi kêmî te heye, tu çi dixwazî hîn? Va tu li mala xwe yî, û ma ne ev karê em dikin giş ji bo we ye. Bav bi van gotinan pişta xwe ya xûz dida wan û ji odeyê derdiket, dê jî diranên xwe li ser hev rast dikirin û devê xwe xwar dikir: Rûnê law, tew ku nas bike tu ji wî xortî hez dikî, qey tu dixwazî ez bême berdan law.

Qerebalixa wê cadeyê gişî

Perdeya Sêyem

(Xemgîn bihnçikandî ji xew diveciniqe, Elî ji dermanxaneyê derdikeve)

Xemgîn: (bihna xwe dikişîne) ev çi xewn bû, xwedê xêr bike.

Elî: Xwedê xêr dike, tu di xew re çû bûyî?

Xemgîn: (Bi kêf deştê xwe dide sînga xwe) erê hemd ji xwedê re hemî xewin bû.

Elî: Bibûre xemgîn, ez derng mame te telefona min kir, lê li cem min pir xelk hebûn.

Xemgîn: Ez zanim, karê te pir heye.

Alî: Ji te re dermanê keça te, min jê re dabû alîyekî.

Xemgîn: (Bi kêf)deştê xwe davêje bêrîka xwe bi çiqasî ye doktor?

Alî: Bila vê carê li ser min be, em cîran in û ez rewşa te nas dikim.

Min dixwest ez tiştekî din bibêjim, min navê keça te da komeleyeke xêrxwaziyê bi karên mirovî radibin, ji bo nexwaşîya wê hazirin wê derman bikin, ev kert, navnîşan û numareyên wan li ser in.

Xemgîn: (Bi kêf) ez vê qencîya te ji bîr nakim heya ez sax bim.

Alî: Qencîya çi? keça te û keça min hevalê hev in û bi hev re dixwînin û timî qala wê dike pir jê hez dike, de here niha wext derng e berî derîyê xwe bigirin.

Xemgîn: (Hêsir ket çavê wî) xwedê wê ji te re bihêle û nixweşîyê dûrî we bibe, em jî jê hez dikin, bi xatirê te.

(Dike tarî dibe)

Xemgîn: (Bi şêwazê amajekirinê Xemgîn dimeşe û gah dibeze) di navbera min û rêya ajanê de mûyekî zirav ma bû, û yên xerab dizanin çawa wî mûyî qut bikin, hemd ji xweda re ez şaş nebûm, çawa rêyên şaş pir in yên durist jî hene, heger her kes milên xwe bidin hev û benekî li qirka hevalekî xwe, an jî cîrankî, birayekî xwe sist bikin û qirka zuha şil bikin, ma kî tilîya xwe dixe çavê xwe. Destek bi tenê li çepikan nade.

yan pereyên wan pir in, bila bidin ji bo em heqîyê bi destê xwe pêk bînin.

Xemgîn: Rizqê wan fire ye û rizqê min teng e.

Mehmûd: Bi destê me ye, em jî rizqê xwe fire bikin, hew tu bibêjî erê; ez ê her tiştî sererast bikim, ez ê telîfoneke Aîfon ji te re bikirim û ev pere jî bila ji te re bin, pereyên xwe têxe bêrîka xwe, me li vir kola û me li vir veşart, bila kes pê nizanibe, heya hevjîna te jî bila bi tiştekî nizanibe.

Perdeya duyem

(Xemgîn cil û bergên nû li xwe kirine û bi telîfonê diaxive)

Xemgîn: Alo, kanî min hazar heb ji te xwest bû, ev tax û hawîrdora wê, hemd ji xweda re tu dikarî bibêjî serê sedî 60 di bin destê min de ye, xema nexwe niha dest bi diziyê kirine, heya zêr û telîfon ji min re tên. (dikene).

Na.....na min ji bîr nekiriye ew ên ku te xwestin min şandin, wext û diqet pêrfekt e.

Zinar: (Dest û rûyê xwe difirkîne) xemgîn ka çend heban bide min pişt re ez ê pera ji te re bînim.

Xemgîm: destpêkê pereyan bibe.

Zinar: Ez ji ku bînim, heya min zêrên dayika xwe dizîn û min telîfona kurapê xwe jî dizî, ma ye ez cilnê xwe bifroşim.

Xemgîn: Min hinek wêneyên navenada eskerî ya ku biryaê te tê de kar dike, xwest, te tiştek ji min re neanî.

Zinar: Ji min re tiştekî nabêje, weleh ez çiqas pey wî ketim û min hewil da ez agahîyên mîna: ka çiqas silah li cem we heye, hûn çend in, kî berpirsyarê we ye? heya min telîfona wî dizî ji bo ez hinek wênaya jê bidizim, lê min nedît hemû şîfrekirî bûn, lê ez soz didim te vê carê wer, ez ê agahîyan jê bistînim.

Xemgîn: Ev cara sedî ye tu dibêjî û ez heban didim te, lê bi derewan, pereyan ji min re bîne pişt re yên nû bixwaze.

Zinar: (Diqehere... û çavên wî sor dibin, bi dengê bilind şer dikin, radihêje çekê û guleyekê berdide û Xemgîn dikuje).

(Dike tarî dibe)

Mehmûd: Herkes li xwe digere û yê jîr û jêhatî gerek e xwe xelas bike.

Xemgîn: Erê weleh, lê yê jîr û jêhatî wê çawa xwe xelas bike, mîna min.

Mehmûd: Tu çavê min î, ji te re çixareyek û em çareyekê ji te re bibînin.

Xemgîn: (Çixarê vedixwe) çare!, çi ji deŝt feqîrên weke min derdikeve? (dikene). Heger ez nikarim zarokên xwe têr nan bikim û derman bikim.

Mehmûd: Niha tu bi çi difikirî?

Xemgîn: (Dikene) ez difikirim ev çi çixareye te da min.

Mehmûd: (Dikene) tu yê pişt re nas bikî, niha tu çi dixwazî?

Xemgîn: Ez dixwazim dermanê keça xwe bikirim, ez naxwazim deŝt vala vegerim malê.

Mehmûd: Ji cem min, (pereyan dide wî) ji te ji keça xwe re derman bikire û xwarina xweş û cilên xweşik jê re bibe.

Xemgîn: (Çavên wî fireh dibin) çiqas pere ne, na ...na ez nikarim van pereyan bibim, ez nikarim wan ji te re vegerînim.

Mehmûd: Kê ji te re gotiye wan vegerîne, tu dikarî wan bibî, heger tu bi min re kar bikî tu yê ji vana bêtir jî bibî.

Xemgîn: (Bi kêf) ev çi kare ku pereyan pêş de dide.

Mehmûd: Karekî pir sivik e, em ê hinek agahîyan ji te bixwazin yan hinek wêneyan tê bi telîfonekê bigirî û ji min re bişînî, îşê te pê tune ye, di nav re hinek heb hene tê li nav xort û kaçan de û zarokan de jî belav bikî, her carê em ê bi dolar bidin te.

Xemgîn: (Bi tirs) Na...na tu çi dibêjî?! ez nikarim van karan bikim.

Mehmûd: Kî dizane tu heyî yan tune yî? Heger tu birçî bî, kî ji te re dibêje te îroj xwar yan na.

Çima em dûr dixînin, qey keça te ne guneh e? gunehê wê di ŝtûyê te de ye, ji ber ku tu nikarî wê derman bikî, wê bi xwarin bikî, wê bigerînî û cilên xweşik lê bikî, heger bimire wê kezeba te tenê bişewite û ne xema kesekî ye.

Xemgîn: (Bi guhên xwe digre) Beees..bes.

Mehmûd: Na...ne bes e, ma qey ne weke zarokên zengînan e,

(Ronîya dikeyê kêm dibe û rola firoşkar dilîze)

Jin: Roj baş, ev bacan bi çi ne?

Xemgîn: Bi 250 bibe 200 î.

Jin: waaax ev çiqas bûha ye.

Xemgîn: Na ..na ne bûha ye, bi sûnd min 50 werqe jê daxiſt, ez bi xisar difroşim, li wan binere pir baş in.

Jin: Cîranê te bi 150 difroşe, qey hun ji xwedê natirsin, hun her yek ser kêfa xwe difroşin, qey beledî tune ye?!.

Xemgîn: Ji ber ku pere ji min re pêwîſt bû, min guvaşt heya min 150 dayê hemî bacan birin, lê bi pereyên hindik û armanca min ez heqê derman kom bikim, mixabin kêm derket, ez bi hêvî me ku bi deyin bide min.

(Ronî)

Mehmûd: (Dikene) tew kî vê wextê bi deyin dide.

Jin: Roj baş, kanî dermanxane? ez bi kêfa xwe me..

Xemgîn: Roj baş, min niha qala te dikir, te ez nas kirim?

Jin: Bi raſtî na, bîne bîra min.

Xemgîn: Ez xemgîn im, ez firoşkarê sebzeya me.

Jin: Biborîne min dîsa te nas nekir.

Xemgîn: Ne pir girîng e tu min nas bikî, lê ez dixwazim pirsekê ji te bikim, te ji xwedîyê dermanxaneyê yan ji textor re got 50 wereqî ji min re kêm bike?.

Jin: (Bi qehir) ma ne şerm e, ma çi qîmetê 50 wereqî heye, ev der ne cihê bazarê ye, tu yî bidî wekî delalan, ez herim ez derng mam.

Xemgîn: Na ne şerm e, ji ber ku zagon li ser herkesî tê meşandin, ne tenê ser feqîrên weke min. Mane te dixweſt beledîyê ji min re bînî, ji bo çend werqeyan, tu çima bê dengî ha?

Jin: (Kenîya) belkî ev pêncî werqeyên te ji min re daxiſt, ji te re tişkî bike û ji min re tişkî bike, heqê nanekî ye, lê yên zik mezin êdî li pereyên hindik nanerin, bawerke rewşa min ji ya te ne çêtir e, yên zik mezin û serî mezin, ji wan serên mezin re guhertin gerek e, ji ber ku zikên wan pir... pir fire ye, belengazeke wek min tiştekî nake. ez xatir ji te dixwazim.

Xemgin: Here xwişka min, lê rewşa kesekî ne weke ya min e.

Xemgîn: (Bi qehir) ez lêborînê ji kesî naxwazim, ka ez maçî serê te bikim, ez lêborînê ji te û ji civakê gişî dixwazim ku min rêya milet bi erebeya xwe ya marsîdis qut kir, tiştekî din ma, here rêya xwe berdewam bike.

Mehmûd: Bala min li te ye, tu ji vê sibehê de rûniştiye û tu bi xwe re diaxivî, çi derdê te ye?

Xemgîn: Ez pirsekê ji te bikim.

Mehmûd: Erê xalo ka bêje.

Xemgîn: Ev qutiya şîn a heban bûye bi çiqasî?

Mehmûd: Heqê çi xalo? li ber min rahişt pênûsê û buhayê ku dixwazin datînin, ma qey wê ji min û te fedî bikin, yan wê kes hesab ji wan bixwaze.

Xemgîn: Ez zanim ji min û te fedî nakin, niha te bi çiqasî kirî?

mehmûd: Wextê ez derbas bûm bi 5 hezaran da min, heya tu derbas bibî belkî dolar bilind bibe.

Xemgîn: Tu bi xwedê dikî rast e, 5 hezar, 5 qat hatin ser buhayê wê, ma çawa bû?

Mehmûd: Derman ji bo kê ye?

Xemgîn: Ji bo keça min a piçûk e, nexweş e û gerek e ez wê bibim Şamê, lê li gel min tune ye, ez ê çawa dest vala vegerim û nalenala wê ji guhê min dernakeve.

Mehmûd: Ka rabe ser xwe, ma heya sibê tu li vir bî jî tu yê çi bikî, ne derman didin te û ne kes keça te derman dike, ma ne rast e?. Guhdar bike xalo, gerek e tu rêyeke din ji xwe re bibînî.

Xemgîn: Min ji te fêm nekir?

Mehmûde: Ka ji min re bêje tu çi karî dikî?

Xemgîn: Ez sebzeyan difroşim. sibehê haya êvarê ez bandikim û bandikim, werin bikirin bacanên sor wekî xwînê.

Werin bikirin xiyarên bexçe hîn teze ne, werin îsotê Amûdê werin. Li me dixîne germa havînê em dişewitin û serm û qeşa zivistanê em diqerimin, em şer dikin bi dev û diranan tenê ji bo em heqê nanê xwe yê rojê peyda bikin, lê îroj barê min pir giran e gerek e ez dermanê keça xwe bînim û ez pir bilez bûm û min bandkir werin bikirin kîlo 250 ye, lê bibin tenê bi 200. Jinek hat tu dizanî çi got?

Herger

Heger her kes milên xwe bidin hev û benekî li qirka hevalekî xwe, an jî cîrankî, birayekî xwe sist bikin û qirka zuha şil bikin, ma kî tilîya xwe dixe çavê xwe..

Fatma Ehmed

(Xemgîn li ber derîyê dermanxaneyekê rûniştiye û raçêta dermana di destê wî de ye)

Xemgîn: (Radihêje raçêtê) niza ev derman jî bûha bûye yan na, niza wê perê min têrê bike yan na?.

Mehmûd: Xalo, ka rê bide min ez derbas bibim.

Xemgîn: (Matmayî li dora xwe dinere û biqehir) ev rê giş li pêşîya te vekiriye, tu tê de neçûyî, ez rebenê xwedê li vir rûnistî me min rê girtiye, va ez rabûm kermke derbas be.

Mehmûd: Bihna xwe fire bike xalo, ez lêborînê ji te dixwazim.

Dema min kenara dînbûnê
derbas kir
Çendî rê vedayî diyar bû.
.....

Gelo, tu ewr tune ne,
ku hindekî
ji dijwariya rokê
sivik bikin?
.....

Bi roj,
tu kes xwe li kelmêşê
nake xwedî.
.....

Çendî
- di nîvê havînê de -
baweriya bi berfê
zor e.
.....

Hilfirîn
diyariya kurmekî ye,
ku xwe bi hevrêşmê
dorpêç kiriye.
.....

Kê pelên dara tiwê yên şîn
Ji kurmê hevrêşmê re,
xwarinek hilbijartine?
.....

Çikandina hezarê derziyan,
di cawekî hevrêşmî de.
.....

Li ser sênceke bê ban,
kilîteke zingargirtî,
pasvaniya dergehekî riziyayî
dike.
.....

Dema radiwestim
û li bahoza di nav spîndaran de
dinihêrim,
ez dexsokiyê li tu kesî nakim.
.....

Li ser palgehek hişk,
keçikeke hişiyar xwe palda ye,
bazinekî erzan
di nav pûş de ye.
.....

Keçikeke ciwan
di nav zeviyê kahoyan re
derbas dibe,
bêhna gwîzên taze
difûre.
.....

Bi zorê mîrokek
bi qurmê dareke pîr ve
hildikşe,
gelo
bi kû de?

werger

Çend Wêneyên Helbestî

Ebbas kiyarustemî
Wergera ji Erebî: Qadir Egîd



Sîka min bi min re ye
carnan li pêş e,
carnan li kêlekê ye
û carnan li paş e,
rojên bi ewr
çendî xweş in!
.....

Hebûna bi te re
min êşkence dike
hebûna min bi min re
min ditirsîne,
ka nebûn?
.....

Li ser têla cilan
gumlikê min ala azadiyê ye.
Ji dîlbûna laş
sivik û azad e.
.....

Navê Pirtûkê: **Analîza Du Xebatên Destpêkî yên Rêzimana Kurmancî**

Nivîskar: Samî Tan

Naverok: (lêkolîn)

Bi sedê salan e kurdî zimanê perwerdehîyê ye. Li Başûr û Rojava hê jî ev rewş wisa didome lê li Bakur rewş hinek cuda ye. Lê dîsa jî pirtûkên li ser ziman, yên li ser rêziman û perwerdehîyê jî têne weşandin. Zimanzan Samî Tan balê dikişîne ser perwerdehîya û rewşa zimanê kurdî di sedsala 17 û 18'an

Tan piştî wê berê xwe dide du berhemên ji wan û wan wekî bingeha vê xebatê digire dest. Yek ji wan di sala 1869'an de ji hêla mîsyonerê amerîkî Samuel A. Rhea ve haitye nivîsandin û ya din jî di sala 1922'yan de ji aliyê R.F.Jardine ve hatiye nivîsandin. Berhema yekemîn der barê kurmancîya Hekarî, ya duyemîn jî der barê kurmancîya Behdînanê de ye.

Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê / 2019

Navê Pirtûkê: **Kurd û wargehên wan di pirtûka Sûretu'l-Erd ya Ibin Hewqel de**

Nivîskar: Ibrahîm Ibrahîm

Naverok: (lêkolîn)

Ev pirtûk ji çend beşan pêk tê, tê de rola kurdan û beşdarîya wan di dîroka Rojhilat de hatiye şîrovekirin, di serdema Islamî de, her wiha girîngîya pirtûka sûret el-Erd ya Ibin Hewqel di zelalkirina vê pirsgirêkê de. Û jiyana Ibin Hewqel û pirtûka wî ya Sûretu'l-Erd tê dîyarkirin û girîngiya agahiyên wê, tevlî şîrovekirina rewşa siyasî ya dewleta Islamî li Rojhilat û Rojava di serdema Ibin Hewqel de, di sedsala (4k./10z.) de. û belavbûna kurdan bi firehî li ser gelek herêman di wê dema han de, rengerengbûna civak û jîyana wan (bajarî, gundî, koçer), tevî beşdarbûna wan di aborîya dewleta Islamî (çandinî, pîşesazî, bazirganî) de.

Hijmara Rûpelan: 132

weşanxaneya (Apec Tryck & Förlag AB) -Stockholmê / 2020

Navê Pirtûkê: **Zordestaname (Xûyên Zordestîyê û Kuştarên Kolegirîyê)**

Nivîskar: Ebdilrehman Al-Kewakibî

Ji zimanê erebî: İbrahîm Xelîl

Naverok: (lêkolîneke hizirî)

Ev pirtûka gewre, li ser neh lêkolînan hatiye dabeşkirin, dest bi danasîna zordestîyê dike û bi destnîşankirina dermanê zordestîkûj diçe serî. Al-Kewakibî di navbera her duyan de pêwendîya zordestîyê bi Ol, Zanist, Şikodarî, Pere, Rewişt, Perwerdîya û Jorkeftinê re bi zanist û kûrayî rave dike û lê dikole. Al-Kewakibî bandora zordestîyê li hemû têgihên navborî xweş diyar dike û çi xerabîya ku ketiye nav civakê vedigerîne zordestîya sîyasî û ya olî. Zordestî dijminê zanist û rûmetê ye û durû hogirî xwe dike û Perwerdehî û rewişt ji rê dibe, miletan ji jîyanê bêhêvî dike û berê wan bi tirs, merayî, keysebazî û nokerîyê ve dike.

Hejmara Rûpelan: 182

Cih û Dîroka Weşandinê: projeya Hinarê ya çandî/ Qamişlo 2017



Navê Pirtûkê: **Dîroka Êla Sewêdan**

Nivîskar: Şoreş Reşî

Naverok: (lêkolîn)

Pirtûk lêkolîneke ku dîroka êla (Eşîra) Sewêdan/ sewêdo/ sewêdî derdexê holê.

Hêjayî gotinê ye, Sewêdî li nav Kurdên Anatolîyaya Navîn li bajarê Aksaray û Konya yê dijîn. Di nav vê Pirtûkê de gelek wêne û nexşeyên bi ve êlê re eleqeder in hene.

Ev pirtûk beşekî ji dîroka kurdan derdixe holê, û di dîroka kurdan de ji bo dîrokazan û lêkolîneran wê bibe alîkar.

Hejmara Rûpelan: 200

weşanxaneya Ar/2017





Navê Pirtûkê: **Şengal Vejîna Çilmêran**
Nivîskar: Azad Ararat
Naverok: (Roman)

"Şêx Adî ji Lalişê çil mêr dişîne Çîyayê Şêngalê da ku Şerfedîn biparêzin. Yê ku ji van çil mêran re serkêşîyê dike Brahîm e. Her çil mêr tên ba Şerfedîn. Ji wan re tê gotin Behdîn ango Xwebexş. Ew çil mêr Şerfedîn û Çiyayê Şengalê diparêzin. Ji deverên Çîyayê Şengalê jî mêr dihatin Çilmêran. Li Çilmêran şêx û pîr li hev diciviyan. Ji wê demê pê ve li ser serê girê Çilmêran qube tim hebûye. Di qubeyê de serderî (micêwir) disekinin. Vana xwedî li qube derdikevin û çirayê pê dixin".Roman behsa jiyana Êzdîxanê ya berîya êrîşa DAIŞ'ê ya 3'yê Tebaxa 2014'an û ya piştî êrîşê dike. Di romanê guherîn û veguherîna di civaka êzdî ya berîya êrîşê û piştî êrîşê tê destnîşankirin. Roman bi devê hevjînên hev Xwedêda û Xezalê û zarokên wan Berxwedan, Şaxewan, Vewrês, Mensûr, Tîjda û Pêşerojê tê vegotin.

Hejmara Rûpelan: 128
weşanxaneya Aryen 2018
Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2019

Navê Pirtûkê: **dengsazî û fonolojî di Kurdîya Kurmancî de**
Nivîskar: Berzo Mehmûd
Naverok: (lêkolîn)

Ev tez hewldaneke bo şîrovekirin, destnîşankirin û dabeşkirina dengên zimanê Kurdiya Kurmancî di kategorîyên deng û fonêm û alofon û girafîman de, nemaze, diyardeya dengên awarte wek armanceke sereke di beşê yekem û duyemê vê lêkolînê de di çarçova yasayên dengsazî û fonolojî de hate analîzkirin, ku li encamê du fonêmên nû di Kurdiya Kurmancî de destnîşan dike, ew jî /r/e ya hejok û /k/e ya babirr. Lêkolîn herçende mêtoda wesfdarî û sînkronî gelek rûber girtiye lê dest tavêje rêya analîza paradigmatîkî û sîntagmatîkî di çarçova mêtodên zimanvanî, wek: binyatgerî û dabeşkerî û erkpêderî (wezîfî) û berwerdkarî û beramberkirin û têvajoyî.. htd.

Hejmara Rûpelan: 304
Mastername, Zanîngeha Mardîn/ 2016
Çapa duwem: ji weşanên HRRKê, bi alîkarîya destеya çandê ya herêma cizîr/ 2019

Pirtûkên derketî



Navê Pirtûkê: **Karnameya Reş (Çîna desthilatdar ya kurd û rastîya wê)**

Nivîskar: Hisên Şawîş

Ji zimanê erebî: Vîyan Cûdî

Naverok: (lêkolîneke hizirî)

Ev pirtûk behsa şêwazê çêbûna çînan di kurdistanê da û bi taybet çîna serdest ya kurd dike. Hisên Şawîş dixwaze rûyê rastîn yê çîna serdest ya kurd vebêje û behir û para wê di paşdamayîna kurd û kurdistanê da nîşan bide.

çîna serdest ya kurd ne bi dînamîzmên (hêza gewherî) hundirîn yên civakê çêbû, wê bi destêwerdana hêzên derve şekil girt û hewl da bibe beşek ji çerx û pergala berjewendîyan.çîna serdest ya kurdan bi nasnameya civaka xwe ra xayîn e, wê carinan xwe ereb hesiband, carinan faris, carinan tirk û niha jî xwe tirk-islamîyên nû û faris -şîyên nû dihesbîne!.

Hejmara Rûpelan: 98

Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2020

Navê Pirtûkê: **Bingeha Fêrkirina Rêzimana Zimanê Kurdî, Qonaxa: 1em**

Berhevkirin û amadekirin: Dilovanê Deştê

Naverok: (Ziman)

Berhevkirin û amadekirina vê pirtûkê ji bo şîrovekirin û ravekirina rê û şivîlên sazkirina hevoka watedar di zimanê kurdî de pêk hatiye. Waneyên wê bi du şêweyan hatine nivîsandin. Hin ji waneyên wê li gor şêweyê fêrkirinê yê nûjen amade bûne. Waneyên din li gor şêweyê fêrkirinê yê kevin hatine şîrovekirin. Pirtûk ji şazdeh waneyan pêk tê. Hersê waneyên pêşî tîp, kît û bêjeyê vediwejêrin. Di pey re, her deh beşên bêjeyê jî baş hatine zelalkirin.

Hejmara Rûpelan: 172

Ji Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûriya

Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2017

yazdeh kurdên ku bi topbarana xwedîyê alên reş hatibûn şehîd kirin qal dike. Di romanê de dorpêçana Kobanê ji alîyê hêzên ala reş ên hov ve, şer û berxwedana gelê kurd, şervanên welatparêz li hember êrîşa hovane, alîkarîya Amerîka ya ji bo çek, fişeng û hatina Pêşmergeyên başurê Kurdistanê ji bo alîkarîya şervanên welatparêz ên Kobanê, ji bo têkbirina êrîşa îslamîstên hov ên rihdirêj, her wiha ji bo moral, derûniya ji xwe bawer a runiştvanên kurd ên Kobanê tê qal kirin.

Di romanê de di dema berxwedana Kobanê de, di şerê li dij êrîşkerên îslamîstên hov de ji malbatekê bav, 2 keç û kurek şehîd dikevin. Bi sedan şervan û gelê sivîl têne kuştin. Di romanê de ev hemû têne qal kirin. Dê, bira, ap, jinap li ber çavên Cîhanê şehîd dikevin. Bi dehan kes di heman demê de bi destê xwînxwarên îslamîst têne qetil kirin. Drama û trajedîya malbatên Kobanê dil û kezebê li mirov dişewitînin. Cîhana ku yek ji vebêjerên romanê ye, dibêje: "Nizanim çawa min dikarîbû barê êşeke wiha giran rakira. Cenazeyê dêya xwe, birayê xwe yê ku zavayekî dest bi hine bû, ê bûka bîst rojan, ê xwişka xwe Gulîstana ku em bîst û çar demjimêran ji hev qut nedibûn û birayê xwe yê bavê şeş zarokan û hevjîna wî, ji bilî ap û herdu pismaman. Bûyerên wan rojan wisa giran bû..." Rihdirêjên îslamîstên hov di meha remezanê de ku xelkên kurd bi rojî bûn, wan qetil kirin.

Di beşa duyem a romanê de mirî ji kamerayan re behsa xwe û zindîyên xwe dikin. Yek dibêje; birayê min, jina wî û her sê zarok ser jê kiribûn. Herdu beşên dawîn ên romanê rengekî belgeroman daye berhemê. Di van herdu beşan de kurdên Kobanê yên ku bi destê xwînxwarên rihdirêj hatine kuştin tê qal kirin. Wahşeta ku van îslamîstên hov li Kobanê û li gundên derdorê pêk anîne weke belgeyekê di romanê de tê rave kirin.

Ev romana birêz Helîm Yûsiv weke romanên wî yên berê, serkeftî ye û hêjayî xwendinê ye. Tiştên ku di romanê de besa wan dibe ne xeyal in, ficktion nîn in, rastin. Bûyerên rasteqîne ne. Leheng û fîgurên ku di romanê de hene, bi xeyalî nehatine afirandin. Ew bi rastî hebûn, di berxwedana Kobanê de cih girtine û paşê şehîd ketine. Roman romaneke realîst e, li gor rêbaza realîzma civakî hatiye afirandin.

Bi qasî ku ez zanim, heta niha di derbarê Kobanê; bajarokê navdar, berxwedêr, rûmetparêz ango bajarê berxwedana gelê kurd de çar roman û pirtûkeke çîrokan hatiye weşandin. Divê xwendevanên kurd van pênc pirtûkan bixwînin. Her pênc pirtûk jî hêjayê xwendinê ne.

Berxwedana parastina Kobanê li hember êrîşkarên Daîşê bi herfên zêrîn cihê xwe di nav rûpelên dîroka Kurdistanê ya nûjen de girtiye. Dê hêj gelek berhemên wêjeyî, çîrok, roman, şano û helbestên kurdî li ser Kobanê werine nivîsîn.

romannivîser Balzac dibêje: “Ez tiştên ku ji Balzac fêr bûm, ji dîrokzanên profesyonel, ji îstatîkvan û ekonomîstan pirtir bû.” Zanistîya ku wêjevan ji xwendevanan re pêşkêş dike, di nav civakê de zû belav dibe û li ser civakê bandorê dike.

Di der barê civaka Kurd a rojavayê Kurdistanê de, di derheqê dîktatorê dewleta Suriyê de û der barê tirsa civakî û kesayetî de tiştên ku mirov ji berhemên Helîm Yûsîv fêr dibe, eynê wek ku Engels dibêjê ye. Di romanên wî de bi taybetî derûnîya/psîkolojîya tirsê/tirsa bêdiran/ û rewşa gelêrî/ civakî bi zelalî tê rave kirin..

Romana Helîm Yûsiv a bi navê “Firîna Bi Baskên Şikestî” di nav weşanên ‘’Peywen’’ de derketiye. Roman 127 rûpel e. Ji sê beşan pêk tê. Weşanxaneya Peywend berê li Stenbolê bû, paşê navenda xwe û qada xebatên xwe birin bajarê Wanê.

Qada romanê li bajarokekî kurdan ku bi ewrên reş ê mirinê hatiye dorpêç kirin, ango Kobanê ye, Rojevayê Kurdistanê ye. Dema Kobanê di bin dorpêçkirina xwediyên alên reş ên Îslama siyasî û hov de ye. “Ji çar alîyên dinyayê xwedîyên alên reş bi ser me ve dikişîyan û li derdora Kobanê bi cih dibûn.....Ew ne mirov bûn, ji ber ku wan serê mirovan jê dikirin. Hinekan digotin ew rengek ji balîndeyan in ku mîna qirakan in, lê qirakên pîr in û temenê wan bi ser hezar û çarsed salî dikeve.”

Xwedîyên alên reş, îslamîstên xwînxwar, dijminê mirovahîyê, ên ku serê însanan jê dikin, benzînê li wan dikin û bi zindî agir bera însanan didin û wan dişewitînin, keç û jinan dikine kole û bazara û mezata jinan datînin û wan weke kole difroşin. Di romanê de hovîtîya wan, wahşeta wan tê rave kirin.

Helîm Yûsiv vê romana xwe bi stîlek nû, bi şêweyekî nû afirandîye. Wî şehîdên Kobanê daye axaftin û bûyeran bi devên wan rave dike. Hûnandina vê romana wî naşibe romanên wî ên berê. Ew romannivîsekî ku xwe dubare nake, xwe nû dike û bi hunereke wêjeyî berhemên xwe diafirîne.

Di beşa yekê ya romanê de ravekirina bûyerên li Kobanê rû dan bi devê Rodî, Cîhan û Dara Gozê(gwîzê) tê qal kirin. Rodî bi kurteşîroveyekê xwedîyên alên reş teswîr dike, wan bi xwendevanan dide nasîn ku ji çend welatan hatine û bi alîkarîya dewleta cîran ku birêveberîyeke îslamîst li ser desthilatdariyê ye. Cîhan jî rewşê wiha tîne zimên. “...derdora me bi bûyerên seyr dikeliya. Ji her alî ve em hatibûn dorpêçkirin. Geh av, geh jî elektrîk bi rojan ji ser me qut dibû....kuştina bi şêweyên cihê û dîmenên serjêkirina mirovan û rijandina xwîna wan li ber kamerayan li her deverên dinyayê belav dibûn....”

Di romanê de digel şer, pevçûn û xezeba îslamîstên hov, evîna Rodî û Perwînê heye. Evîneke pak, evîna ku ji hertiştî bi hêztir e. Dara Gozê behsa Perwînê û evîna wê dike. Ravekirina dara Gozê metafor e. Balkişandineke cuda ye derbarê evîna Perwînê û bûyerên Kobanê de.

Cîhan şehîdbûna bavê xwe û

■ **Romana Helîm Yûsiv «Firîna Bi Baskên Şkestî»**

Di hêla ravekirina sahneyên erotîk de, her wiha di qalkirina dîmenên seksî û pevşabûnê de Helîm Yûsîv nivîskarekî serkeftî ye. Di vê hêlê de Helîm Yûsiv, Bavê Nazê, H. Kovan Baqî, Lorîn S. Dogan, Mîr Qasimlo û hinek nivîskarên kurd ên din bêtirs pevşabûnên sahneyên erotîk di berhemên xwe de ji xwendevanan re pêşkêş dikin. Ev jî xwendina berhemên wan weke xwarina xweş bi tehm û lezet dike.

Min der barê Kobanê de 4 roman xwendin/ romana Jan Dost, romana Mizgîn Ronak, romana Medenî Ferho û ya çaran jî romana Helîm Yûsiv e. Kobanê navçeyeke ku di dîroka kurd û Kurdistanê de cihê xwe ê bi rûmet girtiye. Berxwedana Kobanê, şerê ji bo parastina wê li hember xwînxwarên û mêrkujên Daîşa hov, gemar, xwînmij ji alîyê tevahîya cîhanê ve hate dîtin. Kobanê bû sembola berxwedan û lehengîya kurdan, her wiha bû sembola hevkarîya kurdên herçar parçeyên Kurdistanê. Pêşmergeyên leheng ji başurê Kurdistanê hatin û derbasî Kobanîyê bûn û li dij wahşên Daîşa Îslamîst şer kirin û şervanên kurd ku yên parçeyên din ên Kurdîstanê hatibûn û li Kobanîyê kom bûbûn, milên xwe dabûne hev û di qada şer de cih girtibûn, bi mêranî şer kirin û devbixwînên Daîşê têk biribin.

Romana Helîm Yûsiv dîmenek ji berxwedana Kobanîyê radixe ber çavan û bi zimanekî wêjeyî pêşkêşî xwendevanên kurd dike.

Hestayê teorîya sosyala civakî Fredrîk Engels ji bo wêjevan/

Firîna Bi Baskên Şkestî

Evîna li ber siya xwedîyên alên reş

Romana Helîm Yûsiv dîmenek ji berxwedana Kobanîyê radixe ber çavan û bi zimanekî wêjeyî pêşkêşî xwendevanên kurd dike.

Lukman Polat

Di dema koronayê de min gelek pirtûk xwendin. Digel pirtûkên curbecur de min du romanên Helîm Yûsiv jî xwendin. Yek jê romana wî ya bi navê ‘’Tirsa Bêdiran’’ û ya din jî romana wî ya dawîn ‘’Firîna Bi Baskên Şkestî’’ bû.

Bi xwendina van herdu romanan, weke ku min tevahîya pirtûkên Helîm Yûsiv xwendin. Ez ji xwendina çîrok û romanên Helîm Yûsiv hez dikim û berhemên wî bi dilxweşî dixwînim. Ew di berhemên xwe de zimanekî nerm, zelal û hêsan bikar tîne. Ew weke hinekan zimanekî hişk, tevlihev û ji bo neyê fêmkirin ku jê re dibêjin ‘’zimanê akademîk’’ bi kar nayîne. Zimanê wî zimanê gel e, kurdîyeke xas e û wêjeyî ye. Lewre jî xwîner ji xwendina wê aciz nabe.

tê de neyî nekirbane

Bila penaberê xeribistanê bame derbeder mabame, lê li welatê xwe dayika çivîkên sêwî nemabame.

Xwezî te bi avjenîya xwe ez ji pêlên deryayan xelas nekirbame, bila xeriq bûbame xeniqî bame, lê te ez li qiraxa giravê bi tenê nehêlabame.

Xwezî werzên min tev hişk bûbane, şewitîbane te gul û dar û daristan lê neçandibane. Bi heskirina xwe mîna baranê dilop dilop te av nedabane û ji sexteyan re te beredayî nehêlabane

Xwezî te min tênegiştibane, te min nexwendibane tîpên min neneqişandibane, hevokên min li hev nehûnandibane, bila di paşeroja xwe ya tarî de mabame, lê bila te romana jîyana min nîvqurmiçandî nenivîsandibane û destanek bê xwedî te neafrandibane.

Xwezî min tu nas nekirbane, hîs nekirbane bêrî nekirbane lêhûrbûnên min ji te re li hev kom nebûbane, bila wilo bê hest mabame û min ji te hez nekirbane

Xwezî min helbesta xwe li ser te nenivîsandibane, bila pênûsa min şikestibane û rûpelên min tev li ber bayê ketibane û li pey te rojnivîske min xemgîn nemabane.

Dibêjin ew war e lê ne ew buhar e. Çima neketim di wê ferqê de ku her çar demsalên buhara min dizîne.

Di nava keleqijêna havînê de û seqema zivistanê de û ya ziwahîya payîzê de xwezî di nav de winda nekirbane û dagir nekirbane. Tenê li rojava buharek mabû xwezî ew jî netemisandibane.

Xwezî te demsalên zindîbûnê bi xwe re anîbane. Buhara min bi te geş bane xwezî tu ez bane û ez jî tu bane, ji hev dûr neketibane û ji hev veneqetîya bane.

Xwezîîîî dara xwezîyan ber girtibane.

Xwezî

Çima dara xwezîyan ber negirtiye?

Ma gelo xwezî çi ye, hêvî ye ango poşmanî ye?

Nizanim!!

Lê ya kû ez dizanim xwezî min tu nedîtibane û bi dîtina te re xeyalên xweşik mîna zarokan min li hev kom nekirbane

Bi pêpelûkên xewnan ve neçûbame

Bila di xewa xwe ya giran de mabame û te ez li jîyaneke bê wate hişyar nekirbame.

Xwezî wê kêlîya ku min tu dîtî çavê min tarî bûbane.

Bi çavên te min li xwe mêze nekirbane bi rengê te nexemilîbame, bedew nebûbame û kembera xwe min girênedabane.

Bila ji rengê pîrebûqaçê bame, lê bila li dûrî te çavdêrîya bedewîya min nekirbane û di nava lepên guran de nemabame.

Xwezî min dengê te yê bedew nebihîstibane, bi dengê te min awazên xwe saz nekirbane, bila di wê xirecira dengê top û tivingan de bame, dengê zûrzûra gura bane, bila dengê kundê kor bane, lê bila li dûrî te û li benda dengê te dirûvên min mîna gulekî tî, melûl û çilmisî nemabane.

Xwezî wenda mabame li kolana bame şeperze bûbame û bila min mala xwe bi kevirê tirsê û bê bawerîyê di dilê te de,ava nekirbane.

Xwezî min qesta wî welatê ku cihê hêlîna me

Salîha Qasim

derbasî warê huner û dengbêjîyê bibe. Berê xwe dide bajarê Mûsilê û li wir çend stranan tomar dike. Piştre diçe bajarê Bexdayê paytexta Îraqê. Li wir pêvajoyeke nû ji huner û mûzîka Kurdî û ji jîyana xwe re dişopîne.

Bi diplomateykî Ingilîzî re şû dike û çend salan bi evînî û xweşî bi hev re dimînin. Lê hevjîyana wan nadome, ji ber ku hevjînê wê diçe welatê xwe û Elmas biryar dide ku li welatê bav û bapîran xwe bimîne. Hevjînê wê bi rêzdarî biryara wê dixwîne û hemî arzû, zêr û zîvan jê re dihêle.

Elmas xanîyekî mezin ava dike û ew xanî dibe dîdargeha hunermend, dengbêj, mûzîkjen, helbestvan û nivîskarên Kurd. Ji hemî alîyan ve alîkarîyê bi wan re dike ta ku dibin navdar û xwedî ked û xebat. Di sala 1945'an de di beşa Kurdî ya Radyoya Bexdayê de programeke taybet pêşkêş dikir û derfet dida wan hunermendan ku berhemên xwe tomar bikin.

Tê gotin ku piştre Elmas bi "Hacî Evdê Îsmayîlî" re şû dibe û bi alîkarîya wî pir stranên folklorî û gelêrî dide hunermendan. Stranên ku dane wan ev in: (Qumrîkê, Lê lê Êmo, Xiftano, Dotmamê, Hey Nêrgiz, Rihana Min, Hatim Besta Belekê, Gulşînî û Lê Lê Kinê) Saya vê jina merd û jîr li ser çand û kultûra Kurdî heye û mezin e.

Di sala 1957'an de dev ji dengbêjîyê ber dide. Lê alîkarî û merdbûna wê didome.

Hêjayî gotinê ye ku ew keçmama Meryem Xanê ye û hin dibêjin ew meta "metika" wê ye.

Dawiya Elmasê:

Mixabin piştî ku pîrbûnê nepîrçekên xwe di temenê wê de zêde kirin, êş û janan ew dorpêç kir, hemî mêvan, dost û hevalên wê xwe jê dûr xistin, û pişta xwe didanê wekî ku wan Elmas yek rojê jî nedîtibin. Ji ber wê jî rewşa wê zortir û nexweştir dibû.

Li Rêbendana 1974'an dengêbêja pirked diçe ser dilovanîya Xwedê. Berhem, kar û xebateke zor hêja di rûpelên hunera kurdî de li pey xwe dihêle.

Dîsa mixabin û sed mixabin, ku ragihandina Kurdî jî guh nade vê lehenga netewperwer heta ku bêhtirîn gelê me wê nas nakin, navê wê jî seh nekirine, dema ez li ser diaxivim pir kes ji gelê me hene matmayî dimînin, ku çawa jineke mîna wê li ba me heye û em wê nas nakin?.

Silav û aramî li gîyanê wê be, ew ê her bimîne gewhera resen di amojgeha huner û dengbêjîya kurdan de

---

Jêder:

-Gotara "Di hunera kurdî de jinek jibîrkirî heye" Nivîser Enwer Karahan

-Malpera Nefel.com. Nivîskar Enwer dibêje kû nivîskar Bakûrî ev gotar bi kurdiya soranî nivîsandiye û nivîskar Elî Şer wergerandiye zimanê Turkî û piştre wî ji turkî wergerandiye kurdiya latînî.

■ **Hunermenda kurd Elmas Xanê Mihemed**

de li gundê "Xargulê" ji dayîk bûye û li "Cizîra Botan" jîyaye.

Di destpêka sedsala bîstan de û di dema Cenga Cîhanê ya Yekem de malbata wê ji Bakurê Kurdistanê berê xwe didin Başûrê kurdistanê û li bajarê Zaxo bi cih dibin.

Dengê Elmasê pir xweş û nazik bû. Tevlî rewşa jinan a dijwar di wê demê de, Elmas biryar dide ku

Elmas Xan... Elmasa Dengbêjîya Kurdî 1894-1974

Elmas xanîyekî mezin ava dike û ew xanî dibe dîdargeha hunermend, dengbêj, mûzîkjen, helbestvan û nivîskarên Kurd

Narîn Omer

Carnan navê mirov naveroka jîyana wî ronî dike, û em dikarin erê bikin kû navê Elmas Xan Pêvajoyên jîyana wê ronî kiriye, tevî êş û janên wê, nemaze di salên jîyana wê yên dawî de.

Helbet çendî em dîroka hunera Kurdî vekolin, em ê bêtir hunermend û dengbêjên jin û mêr binasin. Wan bi dengbêjîyê folklor û kultûra Kurdî vejandine û rûpelên nû li dîroka huner û çanda kurdî zêde kirine.

Jina di dema xwe de herî navdar û hestyar, Elmas Xan kî ye?

Navê bavê Elmas Xanê Mihemed e. Navê diya wê Asya ye. Di sala 1894'an

- Pîvanên hilbijartina pirtûkên ku tu werdigerînî çi ne û ta niha te çend pirtûk wegerandine?

Berê, pîvana sereke ew bû ku ez ji berhemê hez bikim û wisa bawer bikim ku dê sûdekê bigihîne pirtûkxaneya kurdî. Lê niha bi rengekî din dihizirim; ez dibêjim halê hazir, gerek pîvana me ya sereke pêdivîya pirtûkxaneya kurdî be, an ku divê em berhemên herî bikêrhatî, giring û pêwîst wergerînin kurmancîyê, ji ber ku rewşa me ne ew çend baş e ku em tiştên li gor dil û hezkirina xwe wergerînin.

Min heta niha 8 berhem wergerandine.

- Projeyên te yên paşerojê çi ne?

Niha ez bêhtir li ser bipêşvebirina weşanxaneya Neqşê dixebitim, her wiha dixwazim li ser wergerandina çend berheman bixebitim, hin ji erebîyê bo kurdîyê û hin ji kurdîyê bo erebîyê, yek jî ji soranîyê bo kurmancîyê.

- Di dawîyê de, em spasîya te dikin û heke gotineke te ya dawî hebe kerem bike bibêje.

Spasxweş, mala we ava be. Hêvîya min ew e ku kovara we di xebata xwe de bi ser bikeve.

berhemên ku têne wergerandin di çi astê de ne?

Li gor tiştê ku tê xwestin û hêvîkirin, di rewşa herî xerab de ye. Pêdivîya kurdan bi wergerandina bi hezaran makepirtûkên ji hemû zimanên cîhanê heye lê tiştekî berbiçav nîne. Berhemên ku tên wergerandin jî nayên xwendin. Jixwe tiştê ku baş û bi berfirehî neyê xwendin nayê nirxandin jî. Wergera Kurdî heta niha bi dilxwazî û dilêşî dibe û bi gelemperî bê pîvan e, jixwe weşangerîya Kurdî, bi giranî, guh nade edîtorî, sererastkirin û lêvegera berî çapê jî, îcar derdên me girantir dibin.

- Astengî û zehmetîyên wergerê çi ne û li gor şopandina we, çima ev kar ta niha li Rojava wekî ku tê xwestin bi pêş ve neçûye?

Astengî û zehmetîyên sereke girêdayî hişmendîya civakî û siyasî ya kurdan e. Zimanê Kurdî û pirsa neteweyî ya kurdan bi hev re nebûne yek, bi taybetî li nik kurmancîaxêvan. Kurd zimanê xwe wekî sîsika têkoşîna xwe ya siyasî nabînin, ji ber vê yekê têkoşîna wan bi giştî bi kil û kêmasî ye; seqet e. Kurt û kurmancî, vîna civakî û siyasî ya bipêşvebirina zimanê Kurdî nîne û jixwe rewşa wergerê jî girêdayî pirsa ziman e. Li Rojavayê Kurdistanê, tiştê tê xwestin ew e ku stratejîya Birêveberîya Xweser a ji bo zimanê Kurdî hebe, lê jixwe tuneye û wisa dixuye ku dê nebe jî. Pêdivîya Rojava bi hezaran wergêran û bi dehan sazîyên çalak ên wergerê û bipêşvebirina zimanê Kurdî heye. Ev jî ancax bi rêya vîna siyasî û derfetên madî yên mezin biçe serî. Mixabin ku her du jî tunene!

- Di salên dawî de, nemaze piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, çi kesê ku du zimanan dizane, bi taybetî Kurdî û Erebî, xwe wekî wergêrekî dibîne û karê wergerê dike. Tu vê dîyardeyê çawa dibînî û ta ku kesek karibe wergerê bike, pêwîst e çawa be, ango teybetmendîyên wergêrekî baş çi ne?

Min hinekî li jor rave kir. Rewşa Kurdîyê neasayî ye û karên ji bo zimanê Kurdî hema hema bi giştî bi rengekî nepisporane dibin, an ku ji neçarî. Ji ber wê ye ku her kes -ji min û pê keve- karê wergerê ji ber nebûna wergêrên pispor û xurtîya hewldanên tunekirina zimanê kurdî dike. Divê pêşî bingeheke qayîm were danîn û xebatên perwerdekirina akademîk a bi alavên pêşketî û nûjen bên kirin.

Dûrî van hemû nîşeyan, ez dibêjim ku taybetîya wergera baş e ne ya wergêr; taybetîya wergera baş ew e ku xwîner wê wekî werger nebîne û bi nav neke. Gerek meriv wergera Kurdî wekî nivîsa resen a bi Kurmancîyeke petî bixwîne. Wergêrê baş xweyîyê wê wergera baş e.

Wergerên wî

- Şikeftên Haydrahodahosê, roman, Selîm Berekat, çapa yekê: weşanxaneya Lîsê, Amed, 2013; çapa duyê: Projeya Hinarê ya Çandî, Qamişlo, 2017.
- Mirîyên Sade, roman, Selîm Berekat, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2014
- Her Du Jîyanname, jîyanname, Selîm Berekat, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2014
- Cihûyê Xweşkok, roman, Elî Elmuqrî, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2014
- Jineke Laşqot, kurteçîrok, Ebas Mûsa, Weşanxaneya Lîsê, Amed, 2016
- Hin Pirsyar Der Barê Demokrasîyê De "Sûrîye Wekî Mînak", lêkolîn, Şiyar Îsa, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2016
- Nêrgiz, Selîm Berekat, çîroka zarokan, 2016, Projeya Hinarê ya Çandî, Qamişlo.
- Diwahemîn Hinarî Dunya (آخر رمّانات العالم), Bextyar Elî, roman, weşanxaneya Miskilyanî, Tûnis, li gel Ibrahîm Xelîl, wergera ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebî.

****

- Birêz Ebdelah Şêxo, di serî de em bixêrhatina te dikin.

Tu sax bî û her dem di nav xêr û xweşîyê de bî.

- Tu ji kengî ve bi karê wergerê mijûl dibî û te çima ev xebat hilbijartiye?

Hewldanên min ji 2008an de hebûn lê wekî kar, min di 2010an de deŝt pê kir. Ez hin caran difikirim ku wergerê ez bijartime, ez û wê û Kurmancîyê li hev banîyan. Alîyekî wê yê din jî heye; wekî her kurdekî ku nû fêrî Kurdîyê dibe, min xweŝt tiştekî ji vî zimanî re bikim, sûdekê bigihînim pirtûkxaneya Kurdî. Lê bi çi halî be, min her dem ev kar bi hezkirin kiriye.

- Li gor we, çi giringîya wergerê heye, bi teybetî ji bo miletekî mîna miletê Kurd ku rastî gelek siyasetên bişaftinê hatiye?

Zimanekî ku nû bi ser hişê xwe ve tê û hîn hewl dide ku xwe ji toza qedexekarî, bişaftin û piçûkkirinê daweşîne, ancax dikare bi rêya wergerê rêya xwe xweş bike û bingeha xwe deyne. Hemû gelên cîhanê zimanê xwe bi rêya wergerê bi pêş ve biriye û pirtûkxaneya xwe dewlemend kiriye. Îcar em werin ser kurdan, em baş dizanin ku dem li me buhirîye û gavên ku gerek bû em berî bi sedan salan biavêjin, em îroj hewl didin ku bi çarpêkî biavêjin! Werger dermanê me yê êşbir e lê em hîn hay jê nînin.

- Tu rewşa wergerê li Kurdistanê bi giştî û bi taybetî li Rojavayê kurdistanê çawa dinirxînî û

Nivîskar û wergêr "Ebdelah Şêxo" ji "Şermola" re:

Pêdivîya Rojava bi hezaran wergêran û bi dehan sazîyên çalak ên wergerê û bipêşvebirina zimanê Kurdî heye

Hevpeyvîner: Aram Hesen

Ebdelah Şêxo Di sala 1987an de li bajarê Qamişloyê yê Rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye. Beşê Mafnasîyê yê Zanîngeha Şamê xwendiye. Di sala 2010an de dest bi karê wergerê kiriye û heta niha 8 berhem wergerandine. Di weşanxaneya Lîsê de edîtorî kiriye û her wiha sernivîskarê beşê Kurdî yê kovara Sormeyê ya çandî bû. Yek ji damzirînerên Projeya Hinarê ya Çandî bû. Niha li Qamişloyê dijî, gerînendeyê weşanxaneya Neqşê ye û bi karûbarên çandî û wergerê ve mijûl dibe.

Berhemên wî

Boxeyê Birîvayê, pexşan, weşanxaneya Lîsê, Amed, 2016

ava bikin. Ji sala 1920 heya 1923an di bin serokatîya Mistefa Kemal de kar û xebatên bêrawestan li dijî welatên ku di peymana Severê de bo yekemîn car ku Kurd weke neteweke cuda û xwedî maf hatibûn dîtin, hatin kirin ku encam jî bû vala derxistina hemû bendên peymana Severê û çêbûna peymana Lozanê di 24 Tîrmeha sala 1923an de.

Di vê derbarê de lêkolînvana hêja Eslîxan Yildirim wiha dinivîse:

Niyeta perçekirin û dabeşkirina Kurdistan a li Severê kir ku bêhtir Kurd û Osmanî ber bi hev de herin. Bi îmzekirina Peymana Severê ya rayedarên Osmanî, dewra Împeratorîya Osmanî jî hatibû girtin. Ji Împeratorîya Osmanî bi tenê herêmek biçûk a Anatoliyaya bakurê rojava mabû. Hemû erdên din ên Împeratorîya Osmanî di navbera Îngiltere, Frensa û Îtalyayê de hatibûn parvekirin. Tenê Kurd mabûn li dora Osmanîyan ku serekên Kurdan digotin, di vê rewşa xeternak de gerek em dev ji birayên xwe yên Tirk bernedin.

Kurd bi milîsên xwe yên herêmî li Maraşê, li Entabê, li Mêrdînê, li Mûsilê li ser piyan bûn û nedihiştin biyanî têkevin erdê wan. Bi hevdîtinên bi rayedarên Dewleta Osmanî re, rêberên Kurdan ji bo welatê wan perçe nebe, bi lihevhatina li ser otonomîyê bi Osmanîyan re li hev kirin. Dewleta ku wê nû bihata avakirin, ji erdên Kurd û Tirkan wê pêk bihata ku di meclisa Osmanî de di civîna 28ê Çileya 1920an de ev weke "Mîsaki Millî" hate fermîkirin."(4)

Ders û daxwaz çi ne?!

Dersên dîrokî ji peymanên Severê, Lozan, Qesrî-Şirîn, Seidabad û yên din, ew e ku êdî tenê bi yekbûn, stratejîyeke hevgirtî û hevgirtina partîyên sîyasî li hemû Kurdistanê Kurd dikarin di dîyarkirina qedera xwe ya sîyasî û paşerojê de karekî bikin. Şerê ji bo cîbicîkirina bendên peymana Mîsakî Millî li ser axa Kurdistanê îro jî Erdogan dide meşandin. Sînorê kiryarên wî berfireh û netenê bakur, lê li Rojava û Başûrê Kurdistanê jî xwedî planên qirêj li dijî doza Kurdistanê ye. Di vê planê de Îran, Sûriye û Îraq jî hevalbendên wan in. Gelo bi vê rewşa heyî û li ber çavan re ma êdî hewceye ku em Kurd hertim behsa yekgirtin û hevgirtinê bikin?! Ma êdî partîyên sîyasî li Kurdistanê ji gel çi xwestine û dixwazin ku gel bi can, mal û xwîna xwe ji daxwazên wan re nebûye bersiva herî baş li dijî dahgîrkerên Kurdistanê jî?!

Jêrnivîs û çavkanî

(1,2,3). Peymana Lozan a 24.07.1923

(4) Eslîxan Yildirim, PEYMANA SEWR Û REWŞA KURDAN

Çavkanîyên lêkolînê

- Dîroka Kurdistan, M Emîn Zekîbeg
- Dîroka Împeratoriya Osmanî
- Serhildana Simkoyê Shikak, Shêx Mehmûdê Berzencî û Shêx Seîdê Pîran
- Kurd û Kurdistan - Vasîlî Nîkîtîn

netewperesetî û yekpare ye ku hêşta jî bi dirûşmeyên:" Yek al, yek netewe, yek welat û hwd" ne tenê li dijî hebûna Kurdên bakur, lê li hemberî xwestekên rewa yên Kurdên perçeyên din ên Kurdistanê ye jî.

Piştî peymana Lozanê:

Piştî peymana Lozanê, li Kurdistanê serhildanên mezin li dijî sîyaseta Kemalîstan a înkarkirinê çêbûn. Ji wê xeratir jî bi mûbadeleya erd û nifûsê, ku bi dewleta Yunanîstanê re hate kirin, gellek kes mecbûr man cih û warê bav û kalên xwe yê hezaran sal biterikînin. Pê re jî li bajarên weke Izmîr û Istembolê bi nêrînên rasîstî terhişk ketin ber agirê hêrsa Kemalîstan. Mal û milkên wan hatin dagîrkirin û gellek kes jî hatin kuştin. Bi vê yekê re êdî ew plan bi çavgirtina dewletên serdeset hatin meşandin. Dîyarkirina qedera paşerojê ne bi dengdan û lêpirsînê, lê tenê berjewendîyên aborî û sîyasî bûn, ku gotina dawîyê dikir. Ev karê han ferzkirineke nerewa, dûr ji exlaq û ûrfên sîyasî û 100% berevajî daxwaza Kurd, Ermen û neteweyên din bû. Nerînên çewt ên rêveberên welatên Ewropî ku tenê li ser berjewendîyên xwe yên maddî bi qedera gelên din dilîzin, di dema şerê cihanê yê duyem de jî(1939-1945) felaketên mezin û hemû alî ji Ewropa re jî çêkirin. Helwest û sîyaseta ku heya roja îro jî berdewam e û tevî hemû teror, înkar û sîyasetên hejmonîxwazîyên rayedarên Tirkîye, dîsa jî ew li dijî bizava neteweyî ya Kurd xwedî helwesteke erênî nînin.

Helwesta dewletên Ewropî ji 1920an heya roja îro:

Dewletên Ewropayî, bi îmtiyazên ku li ser axa Kurdistanê didan Ermenîyan û bi dîyarkirina gellek bendên wê peymanê hemû alîyên hiqûqî yên Ermenan rave dikirin. Ev jî bû sedema dilsarîya têkelîyên di navbera nûnerên Kurd û welatên Ewropî de.Wan salan Sureya Bedirxan bi damezrandina Komîteya Serxwebûna Kurdan, kesên weke Silêman Nezîf, Seyîd Ebdulqadir Geylanî, Seyîd Teha Şemzînî, Dr. Ebdulah Cewdet, Simkoyê Şikak û Şêx Mehmûdê Berzencî bi xebatên berfirh re li dijî vê yekê bûn, ku faktora ol bibe sedema pêkanîna dewleteke serbixwe ji Ermenî û Asûrîyan re, ku li Kurdistanê hindekahî bûn. Sala 1918an li Urmiyê ev yeka bû sedama kuştina Mar Şîmûn bi destê Simkoyê Şikak. Ew di nava Kurdan de weke berdevkên tevgera serxwebûna Kurdistanê li Silêmaniyê, Urmiyê û Istembolê rêberên xwedî şiyan û di qada xebatê de jî karê wan li ber çavan bû.

Nakokîyên di navbera Kurd, Ermen û alîgirîya bêlêkolîn a nûnerên welatên Ewropî, bûne sedem ku vê carê "Tirkên Ciwan" bi rêya propagandeyên olî û şandina kesên weke Şêx Ebdulqadirê Geylanî bo Cizîr û Zaxoyê gelek gire-gir û eşîretên Kurdan ber bixwe ve bikişînin ku her du mislman in, û dikarin bihev re dewleteke Kurdî-Tirkî



■ **Peymana Severê**

hevdîtinên sîyasî, lê bi mercekê ku serkêşên çêkirin û têkdana wan peymanên ser kaxezê alîyê Tirk razî bikin ku berjewendîyên wan ên aborî têne garantîkirin. Ji hêla din jî rejîma ku nû tê avakirin wê di warê sîyasî de jî hevalbendê stratejîya wan li hemberî rejîma nûhatî ya sosyalîstî li Soveyetê, biparêze. Peymana Lozan bi wan şertan hate dinê û êdî hemû daxwazên Kurd, Ermen û Yûnanîyan, yên di peymana Severê de tenê li ser kaxezê man.

Dewletên Ewropî û doza Kurd!

Heman dewletên ku bi van gotinan û di serî de jî Fransayê, damezrandina Kurdistanê dipejirandin, piştre dest ji hemû nakokî û gengeşeyên bêencam di navbera xwe de berdan, Kurdistan kirin çar perçe. Dibe ku çêbûna şoreşa Oktober a 1917an bû sedem ku fikra dorpêçkirinê bi rêya rejîmeke girêdayî berjewendîyên welatên hevalbend, bû sedema îbtalkirina peymana Severê. Ji ber wê jî berevajî bicihanîna bendên peymana Severê yên li ser mesela Kurd, Ermen û Yunanî, her wiha kêmnetewên din ên herêmê, destek dane damezrandina Komara Tirkîyê(TC) û tevî fedakirina gelê Kurd, fermana Ermenîyan jî êdî nehate bîra wan. Fermanên ku bi hatina Kemalîstan re vê carê li dijî Kurdan û li ber çavê dewletên mezin berdewam bû. Nasnameya herî dîyar a dewlet an jî komara Tirkîyê ew hîmê wê yê

nebû ku ji hemû rûberê Împeratorîya wan pareke biçûk a axê di destê de mabû.

Hersê bendên peymana Severê tije nakokîyên ji bo paşerojê bûn. Mînaka vê yekê benda 62an e, ew bend jî wiha ye:

Benda 62an sînorên Kurdistanê wiha dide nasandin: "Herêm an jî deverên di navbera rojhilatê çemê Firatê, başûrê Ermenîstan, Tirkiyê û Sûriyê de, yên ku tixûbên wan yê di pêşerojê de bên diyar kirin, ew herêmên ku Kurd tê de bi piranî ne..."

Balkêş e ku bê zanîn: Kurd li Bidlîs û Wanê jî piranî bûn, lê ew du wîlayet li gor benda 62an nediketin nava sînorê Kurdistana serbixwe de.

Di benda 64an; anku di dawîya peymanê de, wiha ye:" Ger piştî damezirandina dewleta serbixwe ya Kurdistanê, Kurdên li wîlayeta Mûsilê(ku beşek ji axa Kurdistanê ye), daxwaz bikin ku tevî Kurdistana serbixwe bibin, yê ti îtîrazên hêzên hevalbend nebin."

Sever û Tirkên Osmanî û Ciwan

Tirk bi vê dilxweş bûn, ku carê di nava sînorên dewleta Osmanîyan de wê Kurd xwedî dewleteke otonom bin. Salekê pîştî dengdaneke giştî li ser daxwazên gelê Kurd, dewleteke Kurdî ya serbixwe wê were damezirandin. Li ser têketina nava sînorên wê dewletê jî Kurdên wîlayeta Mûsilê wê salekê şûn de biketana nava sînorên dewleta serbixwe ya binavê Kurdistanê de. Tirk bigiştî li dijî hebûna Kurdistanê bûn, bes ew haydarî dîroka serhildanên Botan, Rewandiz û Şemzînan bûn. Lê ya girîng di wê peymanê de navê "KURD Û KURDISTANÊ" bû ku li pey çêbûna peymana Lozan heya roja îro jî parlementoya Tirkiyê bi awayekî fermî nas nake. Di dema Osmanîyan de navê Kurdistanê yasax nebû. Ji alîyê Osmanîyan ve çar kesan peyman îmzakirin. Ji ber ku parlemana Osmanîyan roja 18ê Adara sala 1920an hatibû hilweşandin, peyman ji bo erêkirinê negehişt ber destê serok û endamên parlemanê. Bi vî awayî jî negehişt ber destê Sultan Mihemedê Şeşemîn(1861-1926) û weke hemû rûdanên sîyasî yên din di rûpelên Takvim-El Veqayî ku weke rojnameya fermî ya Osmanîyan bû hemû tiştek tomar û belav dikirin jî nehat weşandin û dîtin. Mistefa Kemal ku şeherazayî pêşînîya helwest û dijberîya gire-gir û siyasetmedarên Kurd bû baş dizanî ku bi hebûna Kurdên ku li dijî yên beriya wî rabibûn, yê xwedî kapasîteya ji bo avakirina dewleteke serbixwe bin. Ji ber wê jî zû li ser mesela ol, mezheb û biratîya du gelan bi kesayetên weke Hesen Xeyrî, Diyap axa û hinek kesên dîyar ji malbatên weke Şemzînî û Cemîl paşa re kete nava peywendî û diyalogê. Şerê serxwebûna Tirkîyê tenê dikarîbû bi hêza Kurdan re bigehe encamê. M. Kemal ev yeka baş dizanî. Ew şer bi seroktîya wî û berjewendîyên hevalbendên wan ên paşerojê; anku Fransa û Birîtanîya Mezin, bû sedem ku ew careke din vegerin ser maseya

Kurdan dike. Vê yekê wisa ew ji hev dûr xistine ku ev nakokîya biqasî hemû êşên giran û dîrokî hêşta jî sarêj nebûne. Ev jî bû sedemeke bingehîn ku li dijî hemû bêhiqûqîyên dagirkeran li Kurdistanê heta dijberîyeke devkî jî neyê kirin!.

Naveroka peymanên ku li dijî Kurdan hatine girêdan, heta ji hêla sîyasetmedarên me ve jî baş nehatine analîzkirin. Sûd ji hin xalên nava peymana Severê û Lozanê nehatine standin. Yanî derfetên mezin ji sîyasetmedar û hiqûqnasên Kurd re hebûn ku bi şîrovekirina xal û bendên wan peymanên navbirî, qet nebe rê li ber sîyaseta asîmîlasyona Tirkan a li hemberî Kurdan bigirin. Mînaka vê yekê em dikarin amaje bi vê rastîyê di peymana Lozan de bikin:" Xala 38an wiha ye:" Dewleta Tirk razîye ku hemû kesên li Tirkiyê dijîn di warê zayîn, girêdana bi civatekê anku nationalite, ziman, nîjad an bi olî ti cudatîyê nexe navbera wan de, jîyan û azadîya wan tam û bêkêmayî biparêze."(1)

Peyman di xala 39an û benda (d) de jî rastîyeke wiha radixe ber çavên me:" Herkes ji hemwilatiyên Tirkiyê di peywendiyên taybetî û bazirganiyê da, di karê olî, medya an her babetê weşan û civînên vekirî (di raya giştî) da dikare her zimanî bikar bîne, ji bo bikaranînê ti asteng nayên çêkirin..."(2)

Di heman xalê da, benda (e) jî li ser bikaranîna zimanên cuda ji Tirkî wiha hatiye nivîsandin:" Her çiqas zimanê fermî yê dewletê hebe jî, hemwelatîyên ku bi zimanekî din diaxivin, di dadgehan de ji bo zimanê xwe yê devkî bikarbînin, pêwîst e her babet bi gengazî bên temîn kirin."(3)

Mixabin di nasnadina mijarên wiha de ji bo raya giştî ya cihanê heta roja îro jî dengê Kurdan zêde bilind nîne.

Nûnerên Kurd û Ermen li Severê

Nûnerên Kurd û Ermen ku Bagos Nûbar Paşa û Mihemed Şerîf Paşayê Xendan bûn, li ser qedera Kurdên bakurê Kurdistanê û Ermenan xwedî yek nêrîn nebûn. Ev rewş berîya îmzakirina peymanê dîyar bû. Gengeşeyên wisa tund di navbera wan de bûne sedem ku bi rêya cudabûna mezhebê Kurd û Ermenan sîyasetmedarên Osmanî ji bo berjewendîyên xwe yên paşerojê sûdê bistînin û bi awayekî zîrekane serok eşîretên Kurd ber bi xwe ve bikişînin. Kurd sade bûn û gelekî ji pilanên Kemalîstan ên salên pişt re xafil û bêxeber bûn. Mezhebê wan ê hevpar wê li ser dîyarkirina qedera wan a paşerojê zîyaneke mezin bike. Di rewşeke wiha de nûnerên du gelan jî bêkar nerûniştin:

Şerîf Paşayê nûnerê gelê Kurd 2 daxwazname ji bo maf û xwestekên Kurdan pêşkêşî kongireyê kirin: A yekê li 22ê Adara 1919an, ya duyê jî li 1ê Adara 1920. Her wiha Şerîf Paşa bi nûnerê Ermenîyan re nîqaş vekirin, di encamê de ew lihevhatin û piştî çend mehan tevîhev daxuyanîyeke hevbeş pêşkêşî kongireyê kirin. Ev pêngava du alîyên Kurd û Ermen bi dilê Tirkan

pişti şerê cihanê yê yekemîn jî dehan netewdewletên nû ava bûn. Bi çêkirina peymana Severê re ew weke hincet an jî amrazek bû ku Kurdistanê pê re bikine çar perçe. Ji ber wê jî sîyesetmedarên Kurd ên çalak di qada xebata sîyasî de bi dilsarî pêşwazî jê re kirin. Sedemên jêr nehiştin ku sê bendên peymanê werin pêkanîn:

- Jeopolîtîkbûn û dewlemendîya axa Kurdistanê, ji mêj da bû ku li pey gerên domdirêj ên siyasetmedar, berpirsên leşkerî û gerîdokên biyanî ketibû rojeva dewletên Rojavayî de.

- Hevnegirtineke bihêz di navbera rêveberên Kurd, ku di nava komeleyên weke Cimîyeta Tealî ya Kurd de kar û xebat dikirin. Ev di rewşekê de bû ku hestên Tirkan ên neteweyî bi rêya komeleyên wan hatibûn guhertin, û Ereb jî zêdetir ji Kurd û Tirkan bi dawîhatina şer re ketibûne nava xebata avakirina dewletên xwe yên serbixwe de.

- Bi destnîşankirina sê bendên 62, 63 û 64an re peyamên girîng hebûn:

1. Tenê li pareke axa Kurdistanê ku dikete rojhilatê çemê Firatê de(pareke axa Kurdistanê li bakur) destpêka desthilatdarîya Kurdan ya bi awayê otonomî bûye.

2. Di dema salekê de, heger gelê Kurd bixwaze bi temamî ji Tirkîyê veqete, serxwebûnê bixwaze û pişt re ji vê daxwazê re serî li Koma Netewan bide û ew jî qenaet pê bînîn ku Kurd xwedî wê kapasîtêne û dikarin daxwaza serbixwebûnê pêk bînîn, hingî Tirkîye garantî dike ku ew ê vê daxwazê bi temamî bînin cih, anku wê hemû mafên xwe yên li Kurdistanê ji bîr bike. Di pareke wê peymanê de wiha hatibû nivîsîn: "Pistî ku serxwebûna dewleta Kurdistanê pêkhat, heger Kurdên li wîlayeta Mûsilê dijîn ku pareke axa Kurdistanê ye, bixwazin tevî Kurdistana serbixwe bibin, di vê rewşê de hêzên hevalbend wê nikaribin îtirazê vê yekê bikin."

3. Di peymana Severê de, behsa pareke mezin a Kurdistanê; anku rojhilat nayê kirin ku hevçax bi amadekarî pêkanîna wê peymanê Simkoyê Şikak li nîva wê perçê de hakim û xwedî desthilateke nefermî yan jî hêşta neîlankirî ye, lê dewleta Îranê jî li wira bêbandor e.

4. Sînorên nedîyar di navbera axa Kurdistan û Ermenîstanê de hema zû bû sedem ku nunerên du alîyan li dijî hev xwedî helwest bin. Yanî piranîya wîlayet û bajarên ku diketin nava sînorên dewleta Ermenîstanê, ji kevin de cihûwarê Kurdan û weke axa Kurdistanê dihate naskirin. Siysetmedar Şerîf Paşa di nameya xwe ya ji konferansa aştîyê re şand, ew xal bi zelalî raxistibû ber çavan. Vê yekê dikir ku bi awaye dûrbînane her du alî haydar bin ku heger dewleteke serbixwe ya bi navê Ermenîstanê li ser axa Kurdistanê bê ava kirin êdî du gelên dêrîn ku hezaran sal bû tevî hev dijiyan, wê bibûna dijminên hev. Nakokîya yekê ji vira dihate pêş û dida dîyarkirin ku dewletên çavdêr li ser peymanê, tenê ji bo berjewendîyên xwe yên rojê li dora hev kom bûne.

Bêtifaqîya serekên Kurdan her carê zîyaneke mezin li doza hemû

Lêkolîn



■ **Împeratorîya Osman di sala 1683an de**

sedem ku bihayekî taybetî bidine daxwazên Kurdan. Ew name bû sedem ku pişt re di sê bendên 62,63 û 64an de navê Kurdan û daxwazên wan di peymana Severê de hate dîyarkirin. Sê sal şûn de, bi çêbûna peymana Lozanê di 24ê Tîremha sala 1923an de hemû xwezîyên Kurdan hatibûn jibîrkirin. Vê yekê li ser rewşa tendurist̂îya Şerîf Paşa bandoreke pir xerab çêkir, bi nexweşîya derûnî li dawîya sala 1945an li bajarê Napolî yê welatê Îtalîyayê wefat kir. Wî di wesîyeta xwe da dabû dîyarkirin ku:" Ji ber ku welatekî me tune, termê min bişewtînin û xwelîya wê jî bavêjin nava deryayê..." Ew daxwaza wî bi cih nehat û li gorist̂ana Xidêwîyên Qahîreyê hate veşartin.

Sedemên bicînekirinê!

Bi çêbûna herdu şerên cihanê re, dîzayeneke nû jî li ser erdê bû sedema hinek gûhertinên girîng.

Nasnameya peymana Severê

a. Nav:" Peymana aştiyê ya Severê"

b. Sevres komoneke welatê Fransayê ye, ku dikeve başûrê rojavayê bajarê Parîsê, 9 km ji navenda bajarê Parîs dûr e. Rûberê Severê 3.91 km çargoşe û nîştecihên wê nêzî 25 hezar kes in.

c. Alîyên peywendîdar:

1. Welatên hevgirtî(Rusîye, Birîtanîya, Fransa, Japon û Îtalîya).

2. Imperatorîya Osmanî.

d. Sedemên çêbûna peymanê:

Osmanî di dema şerê cihanê yê yekê(1914-1918an) de li kêleka du Împeratorîyên Alman û Ostreiş-Mecaristanê ketibûn şer li dijî welatên hevgirtî. Her wiha êdî bi pêşkeftina endustrî re pêwîstîya welatên zilhêz bi enerjîyê jî sedemeke din a hilweşîna wê îmeratorîya nexweş bû, ku ji xeynî rojhilatê Kurdistanê sê parên din yên axa Kurdan di nava sînorên wê de bûn.

Hilweşîna Î. Osmanî:

Împeratorîya Osmanî, bi dirûşmeya" Devlet-i Ebed-mûddet -Dewleta xwedî temenê bêdawî " ji sala 1299an heya 1922an biqasî 623 salan di rûberekî berfireh ê cîhanê de xwedî desthilatdarîyek berfireh bû. Di dirêjahîya temenê wê dewletê de, li Kurdistanê hinek serhildan ji bo bidestxistina mafên neteweyî çêbûn, lê ji ber sedemên siyasî, leşkerî û olî wan nekarîn biser bikevin.

Di salên ku êdî bi serhildana erebên mislman re sînorê împeratorîyê tengtir dibû, li Rojhilat û Başûrê Kurdistanê bi serkêşîya Şêx Mehmûdê Berzencî û Simkoyê Şikakî jî şerekî germ li dijî Îranê û Îngilîzan ku li Îraqê hakim bûn, hebû.

Ji 433 madeyên wê peymanê tenê bendên 62,63 û 64 li ser doza Kurdan bûn, bi kurtî tê de hatibû dîyarkirin: Pareke axa bakurê Kurdistanê wê ji axa Imperatorîyê bihata cudakirin û wê wîlayeta Musilê jî piştî salekê li ser ve zêde bibe û dewleteke Kurdî ya serbixwe bi serperiştîya wan hêzan bihata ava kirin. Nûnerê Kurdan Mihemed Şerîf Paşayê Xendan(1865-1945) bû ku di dema xwe de yek ji generalên artêşa Osmanî bû.

Sala 1919an di germahîya guhertinên li pey bidawîbûna şerê cihanê yê yekemîn, çalakîya siyasî û dîrokî ya herî berçav ji hêla Şerîf Paşayê Xendan, li bajarê Silêmanîyê derket pêş. Ew weke nûner û cihê bawerîyê yê doza Kurdan, ji alîyê Şêx Mehmûd Berzencî ve nameyeke tije zanîyarî li ser dîrok û daxwazên Kurdan pêşkêşî Kongireya Aştiyê ya Parîsê kir, ku pêşzemîneyên ji bo girêdana peymana Severê li wê kongireyê hatin diyarkirin. General Şerîf Paşa bi şandina nexşeyeke mezin a erdnîgarîya Kurdistanê ji rêveberên kongireyê daxwaza damezorandina dewleteke serbixwe ya binavê Kurdistanê kiribû. Zaniyarîyên berfireh û îtibara ku bi kesayetîya wî ji hêla rêveberên kongireyê hebû, bû

Peymana Severê û Serxwebûna Kurdistanê

Bi îmzekirina Peymana Severê ya rayedarên Osmanî, dewra Împeratorîya Osmanî jî hatibû girtin. Ji Împeratorîya Osmanî bi tenê herêmek biçûk a Anatoliyaya bakurê rojava mabû..



Kakşar Oremar

Tevî derbasbûna 100 salan û çêbûna hemû liv û lebatên siyasî-leşkerî yên Kurdan, di dirêjahîya sed salên bihûrî de hêşta jî welatê me di bin nîrê koloniyalîstên dagirker de ye. Ji 10ê Tebaxa sala 1920î û şûn de şerê li dijî Kurdan derbasî pêvajoyeke dijwartir bû û pê re jî serhildanên serxwebûnxwazîyê li her derên Kurdistanê dest pê kir.

Ji 10ê Tebaxa 1920 heya 15Tebaxa 2020 tenê rojekê jî li Kurdistanê aştî nebûye. Her carê li pareke axa welatê me agirê serhildanekê geş bûye.

Gelo sedemên çêbûna peymanên siyasîleşkerî li dijî mafên Kurdan çi bûn, derfetên demê çiqas hatine bikaranîn, faktorên binketina doza siyasî li Kurdistanê çi bûn?

ÇAVKANÎ

1. AYDOGAN Îbrahîm Seydo (2013), «Guman 1», rr. 148-156, r 153 in «Hin pirsgirêkên wergerê di kurmanciyê» de, 208 r.

2. EGÎD Qadir (2017-2018), «Wergera Kurdî Rewş. Dîrok. Girîngî û Alozî», teza derçûnê li Zanîngeha Rojavayê, 130r.

3. EHMED Dilêr Kemal: «Wergêran ne kargeheke mekanîkî ya guherîna tîp û peyvan e», on Rûdaw, 11.4.2020, https://www.rudaw.net/kurmanci/opinion/11042020

4. OSMAN Herêm: "Werger û Wate – Lêkolîneke Watesazî", navnîşana nameyeke masterê ye ku Perwîn Osman di sala 2008an de pêşkêşî Fakulteya Ziman a Zanîngeha Koyê li Başûrê Kurdistanê kir. http://candname.com/werger-u-wate/

5. RÊBIWAR Dawûd, «Di pêşketina ziman, çand û ramanê de rola wergerê», on Diyarname, 30.11.2009 http://diyarname.com/article.php?Idx=705

6. XELîL Ridwan (2016), «Wergervaniya Kurdî» on Çandname, 27.082016, dîtina 07.05.2020, http://candname.com/kurdi-u-werger/

7. ZAL Azad (2010), Werger û wergêr -1- (Werger karekî pîroz e û profesyonelî dixwaze) on Diyarname, 01.02.2010, dîtina 10.05.2020, http://diyarname.com/news.php?Idx=3087

8. ZERAQ Dilawer, «Em werdigerînin an Werdigerin?», on Diyarname, 07.11.2009 http://diyarname.com/news.php?Idx=2931

xwe bide vî karî. Her wiha ji me re dide diyarkirin ku hîna jî em li giranî û girîngiya karê wergerê hay nebûne.

-Zimanê serdest bandoreke neyînî li tevgera wergerê dike.

Ji ber ku gelê kurd di qonaxên pir dijawar yên bişaftinê re derbas bûye ku dagirkeran yekser derba xwe li rayê kurdan (zimanê kurdî) dixist; pareke nehindik ji gelê kurd hêj ji zimanê xwe dûr e û nizane bi kurdî bixwîne yan jî binivîse.

Di encama serdestiya zimanê erebî de xwendevanê kurd berhemên erebî dixwîne. Ji ber ku bi zinamê kurdî nizane, dest nade pirtûkên kurdî. Rêjeya xwendina berhemên kurdî kêm e, vêca jixweber xwendina berhemên ku ji bo zimanê kurdî tên wergerandin jî dê kêm be. Em bên bandora vê gavê li kesê wergêr bibînin. Piştî ku ked daye û xwe bi wergerê re pir westandiye, berhema wî ji hêla pareke mezin ji xwîneran ve nayê xwendin. Lewre hejmara kêm ya ku berhemên kurdî dixwînin, rê li ber wê yekê vedike ku wergêr ji karê wergerê, bi taybet ya ber bi kurdî ve, sar bibe û hejmara kesên ku berê xwe bidin karê wergerê kêm bibe. Her wiha ji ber kêmbûna xwînerên berhemên kurdî, werger jî di nav wan de, weşanxane zêde karê wergerê fînanse nakin (bi dirav nakin).

Encam

Ji ber ku me werger wekî zanist hilnedaye dest, em zêde li giranîya vî karî hay nebûne. Her wiha me nikarîbû bizava wergerê ya heyî bi rêk û pêk bikin û rêyeke durist jê re saz bikin. Lewre heta vê gavê karê wergerê bê rêbaz û menheciyet tê kirin û aramnceke zelal jê re tune ye.

Sazîyên wergerê bi piranî belgeyên sazîyên din werdigerînin û pê re nagihin ku destên xwe bidin wergerandina pirtûkan. Jixwe hin ji wan navendan vê dawiyê vebûne û hîna tu berhem encam nedane. Em wergerê wekî karekî serke nabînin, lê di ber karê xwe re dikin. Lewre berhem heta tê wergerandin, demeke dirêj dimîne. Hêj beşeke mezin ji kurdan dûrî zimanê xwe ye û di bin bandora zimanê serdest (erebî) de ye. Ji ber kêmbûna xwînerên berhemên kurdî, werger jî di nav wan de, weşanxane zêde karê wergerê fînanase nakin, her wiha wergêr jî jê sar dibin.

Em guh nadin hûrgilîyên kar û hewl nadin karekî akademîk û bêqisûr encam bidin! Anku piranîya berhemên ku tên wergerandin, nayên edîtekirin yan sererastkirin. Hema hema em kar ji stûyê xwe dikin û xema karekî spehî

Peymangeha Wergerê
4.Navenda Çavkaniyên Zanîngehê
5.Navenda Global li Efrîna dagirkirî

Çima tevgera wergerê li Rojavayê ne di asta ku tê xwestin de ye?

-Werger weke zanist nehatiye perwerdekirin.

Ji ber ku tu saziyên ku perwerdeya wergerê li Rojavayê bi rê ve bibin tune bûn û Peymangeha Wergerê di demeke pir nêzîk de deriyên xwe vekirine, wergêrên ku niha kar dikin, piraniya wan tu perwerde di biwara wergerê nedîtiye û karê wan tenê jîrekiyeke kesayetî ye. Anku wan xwe bi xwe hînî wergerê kiriye. Jixwe ev jî astengîya sereke ya tevgera wergerê li Rojavayê ye.

Wekî ku tê zanîn, li piranîya zanîngehên cîhanî, ji zû ve werger wekî zanisteke xwedî rêzik û rêbaz tê dayîn. Her wiha kesê ku bixwaze bibe wergêr, divê 2-4 salan li ser metod û teorîyên wergerê perwerde bibe. Mixabin ji ber sedemên naskirî (qedexeya zimanê kurdî û zordarîya li ser gelê kurd), ev yek li welatê me nebûye. Bi vî awayî em dikarin bibêjin wergera ku heta vê gavê li Rojavayê tê kirin, heta astekê bê rêgez dibe.

-Ferhengeke kurdî ya neteweyî nîne.

Kelema pêşîn ya ku kesê wergêr lê dilikume ew e ku têgeheke guncav di zimanê kurdî de bibîne, li hember peyva ku dixwaze ji zimanê jêder wergerîne. Sedema vê yekê jî li nebûna ferhengeke kurdî ya neteweyî vedigere; ku wergêr bikare bi rihetî pişta xwe bispêre wê ferhengê. Lewre em dibînin ku wergêr xwe dispêrin ferhengên cuda cuda. Jixwe gelek ferhengên hêja hene, lê hemû jî karê tekane ne û wergêr zû bi zû newêre xwe bispêre wan. Çimkî heman têgeh ji ferhengekê heta ferhengeke din wate û teşeyeke cude digire. Lewre wergêr nema dizane ka ji bo têgeha xwe kîjan peyvê ji kîjan ferhengê hilbijêre. Nebûna ferhengeke neteweyî, barê kesê wergêr giran dike. Ji ber ku wergêr neçar dimîne ku li têgeha rast bigire û ev yek demeke nehindik ji wextê wî dixwe.

-Kes bi çavê kar li wergerê nanihêre.

Li cem piranîya wergêran, werger ne karê sereke ye. Lê belê di ber karê xwe re karê wergerê dikin. Navendên wergerê jî rê ji wergêran re xweş nakin ji bo ku wergerê ji xwe re bikin kar. Dêmek werger wekî karekî nayê dîtin. Ev yek jî bivê nevê hindekî qedrê wê kêm dike û rê li ber digire ku xelk berê

bingeha wergerê dibînin(1). Vêca wergêr ew kes e ku, kesekî jêhatî ye û xwedî paşxaneyeke xurt a zanînê ye, bi metodeke hevgirtî dixebite, xwedî ezmûndarîyeke berfireh e û di zimanê xwe de bi qasî nivîskara/ê ku berhema (an jî teksta) wî/ê werdigerîne, xwedî vegotineke xurt e (2).

Li gor texmînan, dîroka wergerê xwe digihîne 3000 sal berî zayînê. Ku qiral, ji bo ku hêza xwe ji gelên derdorê re bidin xuyakirin, peyamên biserkeftinên xwe bi gelek zimanan dinivîsîn. Her wiha belgeyên fermî û aboriyî bi zimanên cuda dihatin belavkirin. Kevirê Reşîd ê ku di sala 1799'an de hatiye dîtin, wergera herî bi nav û deng e ku ji demên kevin gihaye dema me ya îroyîn.

Yekem wergera berfireh û birêkûpêk ya ji bo kurdî, wergera pirtûka "Şerefname"yê ye. "Şerefname" sala 1597'an ji alîyê Mîrê Bedlîsê Şerefxanê Bedlîsî ve bi farisî hatiye nivîsîn û behsa dîroka kurd û Kurdistanê dike. Mela Mehmûdê Bazîdî di 1858-1859'an de bi navê "Tevarîxî Qedîmî Kurdistan" ew wergerandiye û bi mebesta parastina wê, tevî gelek destnivîsên din, radestî Alexander Jaba yê wê hingê konsolosê Ûrisê bû li Erziromê kiriye.

Her wiha Sala 1823'yan Incîl ji bo zimanê kurdî tê wergerandin. Lê belê zêde ew werger nayê fêmkirin. Cara pêşîn di sala 1931'ê de li Yekîtîya Sovyetê, Erebê Şemo nivîskarê romana "Şivanê Kurmanca" şanonameya bi navê "Koçekê Derewîn" a Aleksandr Araratyan li kurdî werdigerîne (3).

Werger li Rojavayê Kurdistanê:

Ji bo hejimara wergêran û ya pirtûkên wergerandî, amareke fermî li Rojavayê nîne. Ji ber ku tu sazî nîne ku hemû wergêran li hev bicivîne, amar windayî ne. Li vir em dikarin amareke nêzîk ya pirtûkan bi rêya berhemên saziyan, her wiha bi rêya berhemên wergêrên ku me hevdîtin bi wan re pêk aniye, bi dest bixin.

Piroje û navendên ku li Rojavayê têkildarî karê wergerê ne:

1.Navenda Mezopotamiya ya Wergerandinê

2.Projeya Hinarê ya Çandî

3.Zanîngeha Rojavayê -

(1)- OSMAN Herêm (2019), "Werger û Wate LÊKOLÎNEKE WATESAZÎ YA PERWÎN OSMAN E" on Çandname, 24.03.2019, dîtina 10.05.2020, http://candname.com/werger-u-wate/.

(2)- ZERAQ Dilawer (2009), "Em werdigerînin an Werdigerin?" on Diyarname, 07.12.2009, dîtina 10.05.2020, http://diyarname.com/news.php?Idx=2931.

(3)- XELîL Ridwan (2016), "Wergervaniya Kurdî" on Çandname, 27.08.2016, dîtina 07.05.2020, http://candname.com/kurdi-u-werger/

Bizava Wergerê li Rojavayê Kurdistanê

Nêçîrvan Evdilezîz

Ji ber ku me werger wekî zanist hilnedaye dest, em zêde li giranîya vî karî hay nebûne..

Ji ber girîngîya wê û peywira ku pê radibe, wergerê her û her muhra xwe li dîroka mirovahiyê xistiye û her dem di qada zanistê de bûye mijara gengeşeyê. Pira di navbera du çandan de û amûra veguhestina zanistê ji zimanê gelekî ji bo zimanê gelekî din, werger e. Bipêşketina her welatî li gor asta zanista wî tê pîvan. Heke lingekî wê zansitê seqet be, helbet dê ev seqetî xwe berde nava şaxên din yên wê zanistê û li pêş wê bibe astengîyek.

Peyva wergerê di zimanê Ingilîzî de (Translation) e ku tê wateya şîrovekirin û lêkdanê û (tercime) pêşî ji (tercumî) ya Aramî hatiye wergirtin û di dema xwe de ji bo ravekirina (Pirtûka Pîroz) dihat bikaranîn. Werger guhastina naverok û şêwaza tekstê ji zimanê jêder ji bo zimanê armanc bi awayekî zelal e. Bi gotineke din dîtin û şîrovekirina wateyê, ne peyvê, wek

xeber didin. Cezayirî herî zêde karê xwe bi zimanê Fransî pêk tînin. Belkî em jî demeke dirêj bi zimanê Tirkî xebatên xwe bimeşînin. Lê ji bo zimanê Kurdî bibe zimanekî neteweyî û ji bo ku em bikaribin ji zarokan hetanî mezinan di nava herkesî de bidin rûniştin, bikin zimanê rojane, em ê bi sebr û rik xebatên xwe bidomînin. Lewra divê mirov di vê çerçoveyê de nêzî pirsgirêka ziman a demê bibe)).

Çavkanî

● Abdulah Ocalan Rastiya Ziman, Wêje û Çanda Kurd, Weşanên Komîteya Ziman û Perwerdeya Kurdî

● Helmut Felber Terminology and machine-assisted translation, Infoterm, Vienna, Austria, [From: Studies in machine translation, Riyadh, March 1985]

● Felber, H. Terminology manual. Paris: Unesco/Infoterm, 1984, XXI +426 p. (PGI-84/WS/21).

● Felber, H. Computerized terminography in TermNet - the role of terminological data banks. In: SNELL, B [ed.]. Term banks for tomorrow's world. Translating and the computer 4. Proceedings of a conference, 11 - 12 November 1982, London. London: Aslib, 1983, p. 8-20.

● Asma bin Malik, kovara Alamat 43, r153

● Qenatê Kurdo, 1981, Zimanê Kurdî, Rêziman, Weşanên KOMKAR, Frankfurt/M 1981, Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan

● Kamîran Bedirxan, Rêzana Zimanê Kurdî , Paris, 1971

● Celadet Bedirxan kovara Hawar, jimarên 27, sal 1942 û pêde li ser gramêra Kurdî nivîsandiye.

● Reşîd Kurd Rêzimana Kurdî 1957, Şam

● Dr. Ewrehmanî Hacî Marif,

● Cegerxwîn, awa û destûra rêzimana Kurdî, Bexda, 1962

●Bin Malik Esma (2014): Işkaliyet Tercemet Almusteleh Al-lîsanî we Alsîmayî min Alfrensiye îla Al-arebiye, teza masterê, Cami'et Abî Bekir Bilqayid, Tilmisan, Alcezayir. R6

●Dr Qeys Kakil Tewfîq û Dana Tehsîn Mihemed, Ferhengî zarawey Edebî le ruwangey tiyorî Vosterewe. 2013

● Ferşîd Şerîfî (2007), Ferhengî zarawekanî felsefe û zaniste komelayetiyekan, Kurdistan, Silêmanî

● FARSHID SHARIFI(2003) A GLOSSARY OF TECHNICAL TERMS OFPHILOSOPHY AND SOCIALSEINCES, ENGLISH – PERSIAN - KURDISH

● Hassan, Abdullah & Mohd, Ainon, Teori dan Teknik Terjemahan, (Kuala Lumpur: PTS, 1009), p.91.

●دراسات الترجمة، سوزان باسنت ترجمة الدكتور فؤاد عبدالمطلب، دمشق 2012 15 p ص15

●فه ره نكا قازي

●فه ره نكنزاراوه ئه ده بىلةرِوانكه ىتيؤرىفوسته ره وه

●گوڤارى-كورى-زانيارى-كورد1975-2-3-

●عقيل، بهاء الدين عبد الله، شرح ابن عقيل على ألفية ابن مالك، تحقيق: محمد أسعد النادري،)بيروت: المكتبة العصرية، 1998م .ج 1، ص 458

lê di Kurdî de peyva (genî) nêzîkî peyva Erebî (fasid) e.

Beramber qafiya şiirê (paşbend) danîye, lê weke em dizanin têrma (serwe) ji zû ve cihgirtî ye. Di bawerîya min de pêwîst e em têrmên bitemen weke xwe bihêlin ango dest nedinê baştir e. ji ber ku bêserûberî û dutêrmî û sêtêrmî xwendevanên Kurdî dixe nav sergêjîyê de û di nav de winda dibe.

Herçende hindek şaşî di ferhenga Qazî de hene, lê nayê wê watayê ku ev ferheng hemî şaşî ne, ne wilo ya, ev ferheng ji ferhengên pileya yekem dihê, ji ber ku di bawerîya min de ferhengnûs di gelek alîyan de serkeftî ye û xizmeta zimanê Kurdî kiriye.

Ji ber wilo ferhengnûsîya taybetmend ango di buwarên pisporîyê de ku pêwîstî bi karê akademîk û pisporiyane heye, ku gelek şarezayên ziman tê de beşdar bibin û jê re bixebitin da ku van kêmasîyan bidin xuyakirin û metodên nûjenkirina ziman zanistiyane bidin pêş.

Babetê vê lêkolînê babetekî akadîmîk e, pêwîstî bi gelek movikên dîtir heye ta ku babet ji hemî alîyan ve ronî bibe. Ez niha li ser vî babetî kar dikim, bi hêvî me di demeke ne dûr de babetên terminolojîya Kurdî bikeve çapê de.

Li Encama vê Lêkolînê Raya Birêz Abdulah Ocalan

Kurd, pêwîstîya wan bi zimanê standard ku di stratîjîya neteweyî de pêk were, zimanekî hevbeş ku hemî şêwezar xwe tê de bibînin û jê fêm bikin. Di vê kêşeyê de birêz Abdulah Ocalan helwesteke riyalîstî di pirtûka Rastîya Ziman de dide xuyakirin, ku ew jî ka em ê çilo zimanê neteweyî bo Kurdan durist bikin. Ev bi xwe di bawerîya min de doza zimanê standard e ku hemî şêwezar jê fêm bikin. Inca em ê peyva wî wek heyî di pirtûka Rastîya Ziman û Wêje de :

((Ez eşkere bibêjim: Nivîskarekî herî jîr ê di zimanê Kurdî de şareza, çiqas li xwe bide zorê jî, çi qas bikaribe binivisîne jî, nikare zêde xwendevanan peyda bike. Ji ber ku zimanê Kurdî bi xwe tevkujiyekê dijî. Zimanê Kurdî bi xwe negihandine zimanê wêjeyeke bihêz, zemîneke wî ya neteweyî nehatiye pêşxistin, nehatiye pejirandin. Ji sedî pêncî zêdetir bi zimanê neteweya serdest diaxivin. Ev rasteqînîyeke. Kurdî bi xwe hîna negihiştiye rewşa zimanekî neteweyî, ev jî rasteqîneke. Ger em bi lehceya kurmancî binivisînin, ên Soran û Zaza tênagihên, ger em bi Soranî binivisînin, ên kurmanc tê nagihên. Lewra divê mirov li ser zimanê neteweyî biponije. Avakirina zimanê neteweyî jî xebateke pêvajoyê ye. (Oclan A , Rastîya ziman, r35)

((Bêguman divê di televîzyonan de bi giranî li ser vê mijarê were rawestîn. Dîsa divê mirov hêdî hêdî di dibistanên seretayî de derbasî perwerdeya bi zimanê Kurdî bibe. Lê wexta ku ev yek pêk neyê jî divê em xwe perîşan raber nekin. Dîroka me wisa bû. Îro Hindistan jî, pir zêde nikare bi zimanê Hindî biaxive, zêdetirî wan bi İngîlizî

cîyawaz, bo wergirtin û naskirina zanyarî û edebîyat û rewşenbîrîya gelên ku bi zimanekî biyanî hatiye nivîsîn. Inca wergêran pireke miletan bi hev ve girê dide, ji bilî ku dibe hokarê pêşketina zanistî û geşepêdana rewşenbîrî (Bin Malik Esma 2014, r6). Lê kêşeya zarawe roleke girîng di piroseya wergêranê de dibîne û dibe astengîyek li ber wergêr bo derbirrîna naveroka bîrmendî û vedozîna navlêkirinên teknîkî yên nû, ku her ew jî keresteya pêşîne ye di kakilê wergêranê de. Inca, wurdekarî û dirustbûna wergêrana zarawe wek yekemîn gav ji zimanekî ta zimanekî dîtir rê li ber wergêr sivik û rast dike, ku tê de ser bikeve û têkisteke saxlem bide.

Wurûjandina babeta têrmsazîyê, ferhenga pisporîyê dihêne bîra me, ji ber ku wergêr neçar dibe dest bavêje ferhengê bo naskirina wataya peyvên nû û zaraweyên zanistî. Li gor şîrovekirina têrman di ferhenga wergêrana têkisteke zanyarî de buwara babetekî taybet hêsan dike, ji ber vê yekê, wergêr pêwîstî bi ferhengên zimanê pisporîyê heye ku têrm tê de li gor alfebêyê hatine rêzkirin. Bi vî awayî wergêr dikare astengîyên zarawe derbas bike bo nasîna kakilê naveroka têkista zimanekî bîyanî. Inca pêwendîyeke bihêz di navbera babetên wergêranê û têrmînolojîyê (zarawesazîyê) û ferhengê de heye, her yek ji van pişt bi ya dîtir dibeste. (Bin Malik Esma 2014, r6)

Baş e, heger ferhengên pisporîyê di hemî buwaran de bi Kurdî nebin, wê yekê nîşan dike ku berhemên wergerandî di zimanê Kurdî kêm in. Her ev yek bo min bû hokarê serincrakêşanê ku di babetê zarawe de bikolim û vê lêkolînê tê de amade bikim. Em bînin bîra we ku terminology lêkolîneke nû dihête jimartin ku ji sala 1931 Wuster di warê tiyoriya terminolojî de des pê kir.

Her weha li ser pirsgirêkên wergêrana zaraweyên zimanvanîya Kurdî rawestim, ku gelek alîyên serpêyî (الإرتجالية) û nawurdî (غياب الدقة) û ajawegêrî û çendzaraweyî (التعددية المصطلحية)rûçikên dîyarîkiraw in ku dibine kosp û girift li ber têgeyiştina xwênerên Kurd nemaze di zaraveyê Kurmancî de.

Çend nimûne ji şaşîyên ferhengan:

Ferheng û ferhengnûsî jêdera herî girîng e bo komkirina peyv û têrmên ziman di şêweya yekzimanî (monolingual dictionary) yan duzimanî (bilingual dictionary) de. Mixabin kar di danîna ferhengê de zanisteke taybet e û metod û rêbazên wê hene ta ku kêmasîyên wê kêm bibin.

Dr Ewrehmanî Hacî Marif têrma (kirdar)ji (kirdin, kirin) wek têrmeke zimanî beramberî (verb - fiil) bikar tîne, ev peyv di ferhenga Qazî de beramberî (فاعل) a Erebî hatiye. Ka wê çilo çê be, carekê (فعل) e û carekê (فاعل) e?

Di ferhenga Qazî de r375 peyva (pûç) beramberî (fasid) a Erebî danîye, pûç beramberî peyva Erebî (xawîخاوي)

(Bin Malik Esma (2014): r87)

3. Karê takekesane li şûna komkarîyê.

4. Lawazîya pisporîyê di xwendina zimanvanîyê de.

5. Nebûna ferhengên Kurdî yên pisporiyê di buwarên babetên zanyarî de.

6. Cîyawazî di rêbazên danîna zarawe de.

7. Hewldanên serpêyê di danîna zarawe de, bê lêgerana di nav têkiştên corawcor de.

Hindek nimûneyên çendtêrmiyê ji rêzimana Kurdî

Yek têgeh ku ew jî (verb) di Ingilîzî de, yan (fiil) di Erebî de. Beramberî vî têgehî di Kurdî de 8 têrm bikar tên ku ew jî ev in:

Celadet Bedirxan	lêker
Reşîdê Kurd	pîşk
Cegerxwîn	
Qenatê Kurdo	fiil
Dr Ewrehmanî	kirdar
Dr Pakîze Refîq Hilmî	firman
Mesud Mihemed	kar
Sadiq Behaadîn	kirin

Di kovara zanyarî Kurdî de berg 3 beşê yekê, sala 1975, rupel 282 têrmên rêziman yên jor weha rêz kirine:

١ـ مامۆستا توفيق وەهبي : فعل
٢ـ مامۆستا سعيد صدقي : فعل
٣ـ مامۆستا شيخ محمدي خال : كردار
٤ـ نوري علي امين : فرمان
٥ـ مەرەوخ : كردار
٦ـ مامۆستا ئەكورەوئيف : فێل
٧ـ مامۆستا رشيد كورد : پشك
٨ـ مامۆستا جگەرخوێن : شمرذ
٩ـ مامۆستا جلادت بدرخان : كردێ

Ji nav vê koma têrman lijneya ziman peyva (kar) bo (fiil) hilbijart, û peyva (kara) bo (fail , subject), û (berkar) bo (mef`ûl, object), têrmên bo (transitive û intransitive) di Ingilîzî de, ango (lazim û muteedî) di Erebî de wekçawa di vê têkişta lijneya ziman di kovara sêyem de jimar, rûpel 290 de dîyar e:

Ev nimûneyeke barê têrminolojîya Kurdî dide xuyakirin ku têgehên rêziman bi tevahî wilo tên. Ev pirsgirêk di zimanên dîtir de jî heye, lê di Kurdî de zêdetir dîyar dibe. Em bi hêvî ne ku xebateke jidil û bihêz di vî buwarî de bibe, da ku em bigihine encamine zaniştî di yekkirina têrmsazîya Kurdî de, ji ber ku yekkirina têrmsazîiyê dibe bingeheke piratîkî bo zimanê nivîsînê di Kurdî de, bo zimanê hevbeş, dibe gaveke girîng bo yekîtiya ziman bi gelemperî.

Wergêrana navgînan (têrman)

Wergêran barekî taybet e di kirdarê mirovayetî de bo danûştandina di navbera miletan de, navbera keltûrên

Di lêkolîneke dîtir de Dr Qeys Kakil Tewfîq û Dana Tehsîn Mihemed, Ferhengî zarawey Edebî le ruwangey tiyorî Vosterewe. 2013

Soranî	**badînanî**
1.Dahênanî serekî	Dahênana serekî
2.Kêşî berdewam	Kêşa berdewam
3.Bekarhênerî ziman	Bikarhênerê zimanî
4.Cudayî	cudahî

Herdu nivîserên vê lêkolînê sînorên zarawe wekû peyveke ferhengî di nav tevina ristê de ji hev cuda nakin, wekçawa di van nimûneyan de dîyar dibe:

Dahênan**î** serekî Dahênan**a** serekî
-î -a

(-î) û (–a) du nîşaneyên rêzimanî (sîntaksî) ne, lewre ew zarawe her wek xwe mane,…..

Hokarên avakirina têkista wergerandî

Inca wergêrana em behs dikin du factor bi gelemperî tê de belû dibin:

1.Wergêrana naverok û wate û têgeh û têrmên zanyarî ji zimanekî bo zimanê Kurdî.

2.Ev wergîran di nivîsîna têkistekê de xwe dîyar dike ku bi zimanê Kurdî ye, û bi binyateke qayim ku xwînerê kurd jê fêm bike.

avakirina têkisteke Kurdî li encama wergêranê ji ber têkista zimanekî biyanî kêşeya **têrmsazîyê** dide pêşberî me ku ev bi xwe yek ji pirsgirêkên herî girîng e ku wergêr pêrgî wê dibe. **Têrm** peyveke (sade / darişti / lêkdayî) yan jî destewajeyeke têgehekê destnîşan dike, çend tuxmên bingehîn ên zimanvanîyê tê de amade dibin wekçawa di vê nexşerêjiya jêrîn de dîyar dibin:



Ev têkist li ser binyata astên ziman (fonolojî û morfolojî û ristesazî û watasazî)bi tevahî xwe derdibirrê wekçilo di zimanê computer de têkirin an têxistin beramberî (input) û derkirin an derxistin an der-encam beramberî (output).

Çendtêrmî û yektêgeh

Yek ji pirsgirêkên herî berbelav di zimanê Kurdî de çendtêrmî ye, nemaze di babetên rêzimana Kurdî de, ku yek têgeh çend têrmên cîyawaz digirê xwe, her ev jî dibe astengîyek di pêşiya têgihiştina xwînerên zimanê Kurdî de. Hokarên vê çendtêrmiyê ev in:

1. Cîyawazî di asta tuwanista zimanî de navbera daneran de.

2. Cîyawazîya çavkanîyên rewşenbîrîya zimanî li nik wergêran

Ingilîzî	Farisî	Kurdî (Soranî)
Cognition	Marîfet	Zanyarî
Coexistence		Pêkewejiyan
Event	Hadîse	Rûdaw
Evident	Bedîhî	Diyar
Explaination, interpretation	Tefsîr	Rave
Existence	Bûd, wucûd	Bûn, hebûn
Not -being	Nîstî , nihistî, ‹edem	Nebûn , nînî nînbûna tiştan
Existentialism	Wucûdîya	Bûnayetî, bûnxwazî, felsefa bûnayetîyê
Existential	Bûngerayî, wucûdî	Ew kesê baweriyê bi felsefa wucûdî têne
	Bûn esaletî wucûd	Resenayetî
Experiment	Tecrîbe	Ezmûn
Collectivemigration	Muhaceret cem'î (farisî)	koçî bekomel, komkoçî
Concept	Mefhûm, tesewer aqlî	Çemk, mana, wata, têgeh, têruwanîn, tesewerkirin
Conceptual represntationsw		Wênekirdine zeynîyekan, tesewure zeynêyekan
Conceptual thinking		Bîrkirdinewey çemkane
		Xwarin
Nutrition	Texziye	Xwardemenî
	Xîzaa	Xorak
Object	Mewddû'	Babet
Aim	Hedef	Amanc
Origin	Menshe, xastgah, essil	Serçawe, zêd, bineret, binaxe, binçe, nijad, resenayetî, resenî
Original	Esîl, axazîn, eslî	Resen
Paleontology	Dêrînşunasî	Dêrînnasî
Paradigm	Nimûney a'la	Nimûney bala, sermeşq

ku têkişta wergerandinê roleke karîger li nik xwîner bibînê.

Ji taybetîyên wergêr ku deselatdar be di lêksîkolojiya zimanê dayikê de, nemaze, ezberkirina peyvên piranîya şêwezaran, bo ku vê yekê bicih bike, pêwîşt e, wergêr gelek babetan bixwîne nemaze yên nivîserên xudan temen û jêhatî. Ya dîtir pêwîşt e wergêr zimanvan be, kurdîzan be, bikaribe kêşeyên peyvê di hemî buwaran de şîrove bike, bigire ji bingeha morfolojî ta bingeha watasazî û rişte sazî û felsefeya ziman, jibilî ezberkirina wate, hevwate, dijwata û sîwata, û ev yek jî pêknayê heger di herdu şaxên zimanê Kurdî de: Kurmancî û Soranî xwe têrxwendin neke, nemaze di buwarên zanişti û wêjeyî û hunerî de. Bi vê xebatê, samanekî peyvnasî û peyvsazîyê di hişê wergêr de kom dibe. Wilo, rê li pêşîya wî/wê vedibe û dikare bi zîrekî melevanîyê di deryaya wergêranê de bike û berhemine çak bide. Bi vî awayî wergêr dikare metodên zimanvanîyê di danîna têrm û peyvan de zanişt yane bikar bîne ji ber ku terminolojî pêwîşt e ji leksîkolojiyê rêbaza xwe nas bike û têrman pê durişt bike, ji ber ku têrm bi xwe peyvek e, çi sade be, çi lêkdayî be û çi firaz be ango çend peyv bin wek em bêjin (mafê mirovan). (Encûmena Pîran – مجلس الشيوخ). Peyvin hene ji binyata wê xuyanî dike ku ji dema misilmantîyê ve çêbûye, ji ber hebûna bêjeyeke Erebî di laşê peyvê de wek Heftûzk navê core hebeke biçûk e û serê wê tûj e, dema ku deştê mirov digihêyê piçek êş pê dikeve:

Heftûzk navê core hebeke biçûk e û serê wê tûj e di laşê nirovan de derdikeve, dema ku deştê mirov digihêyê, piçek êş pê dikeve:

Ev di binyata xwe ya morfolojîyê de weha dîyar dibe:

Heftûzk, hebtûzk حه ف تووزك heb – tûzk (tûj+k).

Xaleke din jî heye, ew e ku hin caran wergêr dikeve bin bandora qalib û bunyada zimanê yekem de (yê ber wergêranê ye) ku têkişta wergêr bi awakî giran derdikeve, ev yek zimanê duwem qels û hişk dike ta radeyekê xwîner bi hesanî lê tênagihê. Xala dawî hilbijartin û bikaranîna peyvan di cihê raşt û durişt de li gor pîvanên ziman têgehîna xwîneran hêsan dike.

Em ê hin nimûneyan ji ferhengeke têrmên (Kurdî – Farisî) bînin, wek nimûne xwîner bixwîne û hin têbînîyan lê bigire. Wek em bibêjin ciyawazîya Kurdî û Farisî ta radeyekê nas bike, ku kartêkirina zimanê Erebî li Farisî ji Kurdî gelektir heye. Eva han jî dilê me bi zimanê me xweş dike:

Ferşîd Şerîfî (2007), Ferhengî zarawekanî felsefe û zanişte komelayetiyekan, Kurdistan, Silêmanî

hikmê nirxandinê de, ji ber ku danîna paşgiran di peyvsazîya Kurdî de, heger layenekî bihîştokî jî hin car tê de encam dide, pêwîstî bi ezmûneke zimanvanî heye ta ku wergêr bikarê van paşgiran di cihê durist de bikar bîne, nemaze di warê terminolojî de; ango danîna peyvên nû di buwarên zanyarî de ku ev mijar bi tena xwe dergehekî nû di ziman de vedike, bo nimûne çima em dikarin peyvên mîna (serwer, hestewer, bîrewer /bîrwer/ bîrwir, perwer, dadwer . . .htd) lê em xweş nabînin ku em bibêjin (ramanwer)? Di bawerîya min de gelek hokar bo vê yekê hene, çi watasazî û çi morfolojî ku bunyada peyvan roleke xwe ya taybet heye di asta wata û sazana wan bi paşgiran re, bo nimûne peyva (ser) dikare gelek paşgiran wergire wek (*ser-ok, ser-e, ser-dar, ser-wer, ser-în, ser-ek, ser-ik, ser-î, ser-ane, ser-wan,* (serwanekê devihan), . . .htd) ji ber ku peyva (ser) yek ji wan peyvên giştî ye, çalak e û bipêt e (ango xisûbet têde heye), rûberekî watesazî fireh jê re heye di hilgirtina mebest û watayan de. Peyvên binke (base word), her yek şiyaneke xwe yî taybet heye di wergirtina paşgiran de, ku ev bi xwe di hestê Kurdîzanan de diyar dibe. Di zimanvanîyê de rêbaza pîvane heye ango (alqiyas, analogy) ku tê de paşgir û pêşgir dikeve ber lêkolîneke têrûtesel de kêşe çareser bibe. Bo nimûne em dikarin bibêjin (bîrmend), lê (ramanmend) di dengkirin û bilêvkirinê de giran e, lê (ramandar) li hev tê, sedema vê yekê jî, ez weha dibînim ku binyata fonolojî ya peyvê lihevhatinek jê re heye, tevina dengên ziman jîngeheke taybet dixwaze ta ku wate û mebestê bide. Dr Cemal Nebez di gotareke xwe de peyva (bîrkarî) beramberî (fikrî) xweş didît, wek em bêjin kêşeyên bîrkarî (qeddaya fikrîye) ango ew kêşeyên ku di buwara bîr de dikolin. Baş e, lê kêşe li nik têrma (bîrkarî) ya bi wateya (riyadiyat, mathematics) derdikeve, inca yek têrm bo du têgehan li nik têrimsazan ne hewqas libar e, tevî ku ev kêşe di hemî zimanan de peyda dibe, wekçawa di zimanê Ingilîzî de têrma (morphology) hem di zimanvanîyê de û hem di biology û anatomy de bikartê. Lêkolînên min di vê mijarê de bi firehî hene, di vê gotarê de mebesta min tenê ku ez amaje bi girîngîya wergêrana peyvê di asta zarawesazî de (terminology) bikim ku ev yek ji wergêrana ristê(hevokê) pir dijwartir e. Her weha şaşî û kêm zanyarî di wergêrana zarawesazî de zîyanê digihîne zimanê Kurdî di têkistên wergêr de. Wergêrana têkistên edebîyata nûjen an têkistên bîrkarîyê karekî ne hêsan e, bi taybetî ji ber hebûna têrmên zimanê biyanî, û kêmbûna têrmên zimanê Kurdî, jibilî ku hejarîya wergêr jî barekî zêde ye li ser barê têkistê de, ku xwîner sûd jê wernagire. Bo hin nivîserên me yên nûhatî ya baş ku xwendina xwe di zimanê Kurdî de zêde bikin, û nivîsînê kêm bikin. Ya dîtir jî hilbijartina buwarekî zanyarî yan wêjeyî li gor şîyana xwendina wergêr pêwîst e, da

ê dide, ji ber ku navgîn bi xwe hokareke yan (wesîle) ye, wekçawa kesek an tiştek navbera du kesan de gihaştinê û pêwendîyan dirust bike, wilo jî navgîn çi weke navlêkirinê be û çi weke hokarek navbera du alîyan de pêwendîyan girê bide, wekçawa navgîn derbirrîneke boçûna zihnî bi wî tiştê riyalîstî ve girê dide, yan amaje lê dike. Lê dîsa ev yek pêwîstî bi gengeşe û danûstandinê heye. Ji ber ku danîna navgînan pêwîstî bi gelek zimanzan heye ta ku bigihin biryara dawî. Inca ev term weha tên:

Ingilîzî	Erebî	Kurdî
Term	Musteleh	zaraw, zarav, zarawe), navgîn
concept	Mefhûm	Têgeh, çemk

Wergêran û têrmsazî

Weke em tev dizanin Rojava ji berîya heşt salan ve hewl dide ku xwe amade bike bo danîna pertûkên xwendina seretayî û amadeyî û navendî ku hersê qonaxên xwendina fermî dide ber xwe. Xwendin di dibistanên fermî de di piroseya perwerdekirinê de birêve diçe ku mamosta û avahî û pirtûk jê re divin. Mijara me di vê xelekê de rola wergêranê di danîna madeyên xwendinê, wek e: Matmatîk, Fîzîk, Kîmya, zanyarî, cografya, dîrok, ziman û wêje û yên dîtir. Madeyên xwendinê di fêrgehên fermî de pêwîstî bi bernameyên drust û serrast heye, ev drustî di dahênana têrmsazîyeke zarxweş û hevgirtî li pêka têgehên zanyarî û zanistî. Heger lawazî hebe jî, ev lawazîya xwedîyê ziman e. ji ber ku ziman di zevîyeke xweş de şîn hatiye, Ziman wek ku zimannasê binavûdeng, Jakobson dibêje: Ziman amêreke dikare her tiştî derbibirre û her zimanek hokarên xwe hene bo derbirrîna zanyarî û zanistê. Em nikarin bibêjin ev ziman an ew ziman nekar e, ji ber ku nekarî ya xwedîyê ziman bi xwe ye, yên ku bi awayekî zanistyane bi pêşketina zimanê xwe ve xwe newestandine. (Dr Leyla Almesudi).

Yek ji pirensîpên wergêranê drustîya watayên zimanê yekem (jêder) ku bi heman kartêkirinê di herdu zimanan de (yekem û duwem) dîyar bibê (Hassan, Abdullah & Mohd, Ainon,2009, r91). Ji ber wilo, wergêr pêwîstî bi çalakî û zanyarîyên taybet bi zanista wergêranê heye, û yek ji wan agahîyan ew e ku wergêr bi zanista morfolojî ya herdu zimanan şareza be, wek piroseyeke girîng di danîna peyvê de, bo ku bikarê watayên peyva wergerandî di qalibekî rast û durist de saz bike. Bo nimûne di wergêrana computer de peyva (ramanwer) beramberî (almufekir) a Erebî hatiye ku ev term nakeve ber encama ti rêkeftinan navbera çend zimanzanan de ku em wan bixin bin

Kurdîyê vedike. Inca ya herî girîng di vê mijarê de em çilo wan têgehan ji zimanê bîyanî bikin Kurdî, inca kêşeya têrmsazîyê xwe dide pêş. Ya dîtir têrm bi xwe di têvajoya keltûrî û şaristanîya wî miletî de tê (dihêt).

Wergêran zanisteke dikeve nav beşê zimanvanîya piratîkî de, ku îro teorîyên wergêranê çêbûne. Wergêran li ser bingeha zimanvanîyê birêve diçe. Ji nav wan kesên ku xwe di pêvejoya lêkolînên wergêranê de berhem dane New Mark û Susan Bassnett û George Mounin û Nida û hinên dîtir (Susan Bassnett, r15)

Di lêkolînên têrmsazî û wergêrana alîkarîya alavî (Terminology and machine-assisted translation, Riyadh, March 1985) Helmut Felber yek ji têrmsazên binavûdeng e di cîhanê de, di dezgeha (Infoterm, Vienna, Austria) de kar dike weha dibîne: Têrmsazî rola kilîtê di wergêrana mirovan de her weha di ya malavî de di warê têkistên zanistî û teknîkî de. Termsazî komek e ji têrman nuwêneriya sîstima têgehan dike, taybet in bi her buwareke zanyarî de. Ev têkist bi zimanê Ingilîzî weha hatiye: (Terminologies play a key role in human as well as machine translation of scientific and technical texts. Terminology is an aggregate of terms representing a system of concepts, particularly in a subject field. It has still another meaning: a field of knowledge dealing with concepts and their representations, the terms). (Terminology and machine-assisted translation, r117). Bo agahîyên zêdetir vegere van herdu çavkanîyan:

●Felber, H. Terminology manual. Paris: Unesco/Infoterm, 1984, XXI +426 p. (PGI-84/WS/21).

●Felber, H. Computerized terminography in TermNet - the role of terminological data banks. In: SNELL, B [ed.]. Term banks for tomorrow's world. Translating and the computer 4. Proceedings of a conference, 11 - 12 November 1982, London. London: Aslib, 1983, p. 8-20.

Inca berî ku em des pê bikin dixwazim hin peyvan di terminolojîya zimanê Kurdî de şîrove bikim, çend peyv pêwîstî bi ronîkirinê heye wek peyva (zaraw yan zarawe) di şêwezarê Soranî de beramberî (mustelehمصطلح) a Erebî, û (term)a Ingilîzî tê. Di vê dawîyê de peyva (têgîn) li Bakur peyda bû beramberî (musteleh). Inca di Kurdî de du têrm (zarawe, zarawesazî) û (têgîn) xwe tavêjin meydana nivîsîna Kurdî beramberî (term û terminology termsazî). Di şîrovekirina (terminology) de peyveke dîtir heye ku ew jî bi Ingilîzî jê re (concept) dibêjin, di Kurdî de beramberî (têgeh) û (çemk) tê, ku di Erebî de peyva (mefhûmمفهوم) beramberî wê tê. Di dîtina min de ji nav van peyvan (têgîn) hewqas li guhê mirov xweş nayê, ya dîtir jî mebesta (musteleh) nade. Di bawerîya min de heger (navgîn) li şûnê danin dê xweştir be, ji bilî ku mebesta (navlêkirin)

Pirsgirêka Têrmsazîyê Di Pêvajoya Wergêrana Kurdî de

Avakirina têkisteke Kurdî li encama wergêranê ji ber têkista zimanekî biyanî kêşeya têrmsazîyê dide pêşberî me ku ev bi xwe yek ji pirsgirêkên herî girîng e ku wergêr pêrgî wê dibe.

Berzo Mehmûd

Yek ji babetên balkêş di serdema niha de û di piroseya nivîsîna hevçerx de dîyar dibe kêşeya têrmsazîyê (terminology) ye, bi taybetî di piroseya wergêranê de, ji ber ku têrm roleke sereke di wergêrana zanistê de dilîze, weke çawa Xwarizmî dibêje: Wergêrana têrm kilîta hemî zanistên dinyayê ye (Asma bin Malik, Alamat 43, r153). Ji ber ku wergêran guhastina têgehan ji zimanê yekem bo zimanê duwem. Zimanê yekem Erebî ye yan Ingilîzî ye yan çi zimanekî zindî, lê zimanê duwem zimanê Kurdî ye ji ber ku wergêran ji zimanekî cîhanî bo Kurdî rêya pêşketinê bo

Girîngîya wergera wêjeyî ji rola ku pê radibe û dilîze di warê ronakbîriyê de, tê destnîşankirin, ji ber ku çanda mirovî ya her miletekî di wêjeya wî de veşartiye, wergera wêjeyî di asteke bilind de dibe alîkar, çanda neteweyan nêzî hev dike û di vesazkirin û diyaloga di navbera çandan de jî xwedî roleke girîng e, her wiha wergera wêjeyî amûrekî sereke ye ji bo fêmkirin û têgihiştina çandên cuda, lewma tê gotin ku wêjeya cîhanî ji afrandina wergêran e.

Awayên karkirina di vê beşa wergerê de, li gor armanca wergera metnê, têne guhertin. Yek Ji taybetîyên vê wergerê ew e ku wergêr serbest e û dikare destwerdanê di deqê de bike û li gor xwe tev bigere, lê bi mercê ku bandor li wateyê nebe û ew destwerdan têkeve xizmeta wateyê de. Her wisa pêwîst e yê wergêr ji rastîya wateyê dûr nekeve û bi spardeyî hestên nivîskarê zimanê jêder veguhezîne zimanê armanc. Di wergera wêjeyî de guhpêdan bêhtir dikve ser veguheztina hest, çand û wêjeyê de, lewma wergêr bi spardeyî wergera xwe dike, armanceke serke datîne ber çavên xwe, ew jî wergerandina ruhê nivîsa di nav destên xwe de û ji wergera tîpane dûr dikeve, ji ber ku wergera wêjeyî xwe dispêre zanebûn, huner û çanda wergêr û pisporîya wî di bikaranîn fêmkirina têgehên çandî yên herdu zimanên(armanc, jêder) de, her wisa zanebûna wî di zimannasî û rewanbêjîya zimanê armanc de rol û risteke bingehîn dilîze, da ku karibe deqeke wêjeyî ya baş biafirîne. Lewma ev beşa wergerê xwedan zehmetî ye jî, û pêwîst e wergêr afrîner be, ji ber ne tenê wergerê dike, lê di heman demê de divê hesatn jî bi awayekî durist veguheze, û bihêle hestên xwîner çawa bi deqa resen re dilivin, wisa bi deqa wergerandî re jî hestên wî bikevin liv û tevgerê de.

Rewşa wergerê li Rojavayê Kurdistanê:

ji ber ku karê wergerê li Rojavayê Kurdistanê piştî salên şoreşê hinekî liviya, lewma ta niha di vî warî de karê ku tê kirin bi lawazî dimeşe. Ji ber ku ji hêla kesan ve tê meşandin û nebûye karekî saziyane. Bi awayekî takekesî werger tê kirin, ji lewra pirtûkên ku têne wegerandin jî di asta yekemîn de li gor hezkirina kesê wergêr e, Keda ku ta niha di warê wegerê de hatiye dayîn, tevî ku kedeke pîroz e, lê ne di asta pêwîstiyên demê û civakê de ye, carnan pirtûkên têne wegerandin ji bo civakê ne pêwîst in, û gelek pirtûkên ku pêdivî bi wan heye hîna nehatine wegerandin û ihtiyaca civakê û pêdivîyên pirtûkxaneya kurdî li berçavan nayê girtin. Ta ku ev kar bi şêweyekî durist bi rê ve biçe, pêwîst e gudaneke baş bi wergerê bê kirin, saziyeke taybet bi wergerandinê bê damezrandin, wergêrên pispor û şareza bigre nava xwe, û bi pilan û bi awayekî rêxistinkirî pirtûk li gor pêdiviyên pirtûkxaneya kurdî bi giştî bêne hilbijartin û wergerandin. Ù li aliyekî din ev zanist bi awaeyekî akademîk bê xwendin, da ku wergêrên pispor derkevin holê û berhemên hêja û layiq bêne afrandin.

wergerê zanist û pêzanînê derbasî nava xwe bike, Yûnanîyan xwendekarên xwe dişandin Misra kevin, da ku li wir fêrî stêrnasî, matmatîk û hemû zanistên di wan demam de belav bibûn û ew zanistane werdigerandin zimanê xwe. Romanîyan jî felsefe û wêjeya Grekan werdigerandin zimanê xwe. Her wisa gelê Ereb jî zaninst û zanebûna gelên ku bi rêya bazirganîyê digihaştin hev mîna Firs, Hind, Rûm, Hebeş û….hwd. werdigerandin. Lê gel Ereban jî, di serdema Ebasîyan de û piştî firehbûna sînorên dewleta wan, her wiha firehbûna têkilîyan di navbera wan û gelên din de, lewma pêwîstî bi wegerê hate dîtin, lewma tevgera wergerê di vê sedemê de û bi taybetî di dema Harûn Elreşîd û kurê wî Mamûn de wergerê xurt û geş bû. Û hemû zanistên wê demê mîna: Stêrnasî, Bîrkarî, Felsefe, Mûzîk hatin wergerandin.

Di roja îroyîn de jî, hemû civakên ku dixwazin bi pêş bikevin û li şûn miletên din nemînin, girîngiyeke mezin didine wergerê û hemû nivîs û pirtûkên girêdayî teknolojî, pîşesazî, wêje û zanistên curbecur bi rêya wergerê vediguhezînin zimanê xwe, da ku zarokên wê civakê karibin bi hêsanî wan zanistan nas bikin û bi zimanê xwe yê dayikê zûtir fêr bibin û di nava civakê de belav bikin.

Di wergerê de ravekirin:

Wager, di asta yekemîn de xwe dispêre ravekirinê, lê ew jî di gelek cihan de têrê nake, lewma kesê wergêr hewil dide ku awayê deqa ku tê wergerandin, veguhezîne zimanê armanc. Ev jî tê wateya ku werger çiqasî li ser bingehên zanistî û hunerî jî hatibe avakirin, lê di encamê de ew mîna şîrovekrinê ye. Lewma werger di radeya yekemîn de, ji nû ve afirandina deqê ye, ji bo ku di milê şêwaz û wateyê de bigihe asteke herî nêzîk ji zimanê jêder re; anku zimanê resen ê pê hatiye nivîsîn, dêmek wate tişta herî sereke ye di wergerwndinê de. Têgihiştin û ravekirin du pîvanên ku mirov di rêya wan re dikare nivîsa ku hatiye wergerandin binirxîne û nas bike ka gelo ev werger serkeftî ye yan na, lê belê divê neyê jibîrkirin ku şêwaz jî di wergerê de roleke sereke dilîze. Bi her awayî deqa wergerandî nikare xwe sedî sed bigihîne wateya rasteqîne, ji ber ku cewherê wergerandinê ew e ku wateyê nêzîk bike, ji ber vê sedemê têgihştin û zanebûna wergêr di herdu zimanên(jêder û armanc) de şertekî bingehîn e, ji bo ku werger serkeftî be û dernekeve derveyî wateya ku di nivîsa resen de hatiye nimandin. Lewma dema wergêr dest bi xwendina metina ku dixwaze wergerîne dike, ew gav bi gav di qada fêmkirinê de dimeşe da ku bighêje wate û şîroveya durist û karibe derbasî zimanê armanc bike, lewra her wergêr mîna ravekerekî ye.

Girîngî û taybetîyên wergera wêjeyî:

Wergera wêjeyî yek ji warên herî girîng e di qada wergerê de, ku wergera metnên wêjeyî mîna helbest, çîrok, roman, şano û hemû şêwe û hunerên wêjeyî û çandî digre nava xwe.

Werger

Aram Hesen

Girîngîya wergera wêjeyî ji rola ku pê radibe û dilîze di warê ronakbîriyê de, tê destnîşankirin, ji ber ku çanda mirovî ya her miletekî di wêjeya wî de veşartiye

Bêguman ziman navgîna sereke ya ragihandin û danûstandina di navbera mirovan de ye, dîrok, çand û şaristanîya her miletekî di zimanî wî de veşartîye, her wiha hemû pêşketinên wan di hemû warên jiyanê de di zimanê wan de diyar dibe, ev di navbera kesên ku bi heman zimanî diaxivin de, lê ji bo ku gel û milet ji çand, pêzanîn û dîroka hev haydar bin û sûdê ji hev bigirin, pêwîstî bi wergerandinê hebû.

Werger: Tê wateya qulipandin, zîvirandin û veguheztinê; anku veguheztina deqekê ji zimanekî bo zimanekî din e. Werger hem zanist e û hem jî huner e. Zanist e ji ber ku rêgez û qanûnên ziman tê de tên meşandin û huner e ji ber ku xwe dispêre afrînerî û xulqkarîya Wergêr, her wiha zanebûna wî di nêzîkkirina çandan de girîng e. Di rêya wergerê de mirovahî bi hemû ziman û çandên xwe yên cuda nêzî hev dibin û ji tecrube û ezmûnên hev sûdê werdigrin.

Werger ji demên kevin de hatiye naskirin, û di dîrokê de roleke mezin di veguheztina pêzanîn û çanda gelan de lîstiye, her miletkî xwestiye bi rêya

Di şoreşa Çinê de jî, dîrokeke xurt û hêza wêjeyî-ramyarî ya Çînê heye.

Va, dema ku em tên rastîna Kurdistanê, kar vedigere berevajiyê. Her tişt hatiye wêrankirin. Çi tevgerên ronahîbûnê ku tu karibî xwe bispêriyê tune ye. Berevajî bi destê Kemalîzmê têgîn û sazîyên Rojavayî ku tê veguhastin Enedolê, hemû jêrsazî û jorsazîya komarê, ji bo rastîna Kurd û hebûnîyên çandî yên li Enedolê, ew tevgera wêrankirin û tunekirinê ye. Raman û sazîyên Rojavayî ber bi wan ve veguhastin û nasdarîkirin na, wê hêza ku jê re hatiye dayîn bi kar tîne û ji holê radike. Bi vî awayî çespandineke berevajî ya metirsîdar heye.

Çawa ku me têgîneke "Çawa Bijîn" avêtibe rastê, ev yek ji bo rewşenbîr jî derbasdar e.

Pêwîst e bersiv bêne pêşxistin ji bo rewşenbîr çawa bije.

Ger em dixwazin rewşenbîr derxînin rastê, ev pirs pir girîng e. Di bingehê bêgavîyan de bûna rewşenbîr nabe. Da ku rewşenbîrî pêk bê, bijartineke azad a di lehê sazîyên yên ne mêtîngerî de, ger hebe hindek bawerî û zanebûna te, xwe ji bo zemîna civakî pêk bîne. Dê bi zextê nebe. Ji ber ku cihê rewşenbîr lê peyda dibe, zext nabe. Ger hebe jî, dê bi misogerî li dijî derkeve.

Va, di vir de rewşenbîr pêwîst e xwe bi her alî ve biçek bike. Bi wateya bêteşe bi çek girtina sermil rewşenbîrî pêk nayê.

Asta ronahîbûnê nehatiye wergirtin.

Ronahîbûna rastînî dikare di zemîna gerîla de pêş bikeve. Ev jî karekî pir xweser û karê hewldanên ponijînê ye.

Em dikarin ji vê re bibêjin ronahîbûna çekê. Her wekî ku çek dide ronahîkirin, pêwîst e çek jî were ronahîkirin. Vêga di nava me de çek hindek tarî ye, bi rengekî ku pêşîyê hatiye ronahîkirin naxebite. Her wiha tam li hedefê nade. Teşeyên din ên bi çekbûnê jî pêwîst in.

dikarin bibin xwedîyê jîyana mezin. Zilamê Kurd di bin navê namûsê de nasnameyê jinê girt. Min ev baş fêm kir. Dema ku keç dibe jin, nasname, ziman û xweşiktî ji dest diçe. Weke ku di destana Derwêşê Evdî de tê dîtin; Edûlê xwedî nasname, evîn û hêz e. Ji serê tilîkan hetanî mûyên porê xwe xweşikbûna xwe diparêze, va evîn! Niha dema ku mirov van dibêje, dibêjin eyb e. Nexêr, ev Kurd e, binasname ye û em nikarin dev ji vê berdin. Jina bênasname nabe, jîyana bênasname nabe, egîdî nabe. Ev felsefeya Ehmedê Xanî û Derwêşê Evdî ye. Va, ji bo vê bi hezaran keçên me xwe şewitandin û gihîştin evînê.

Min bi stranekê dest bi vê xebatê kir. Niha hinek xebatên min nas nakin. Hunermendekî ku straneke baş diafirîne, li ba min ji sed fermandaran hêjatir e. Ez dizanim ka kîjan baştir e. Ev tiştekî weke sedî sed li hedefê xistin e. Dema ku min dest bi van xebatên xwe kir, min got berîya her tiştî divê ev dengê Kurd qut nebe. A duyemîn, min got divê keç wisa bi hêsanî ji dest dernekevin.

sazîyên mêtîngerîyê de dibîne. Naxwaze ku vê zemînê bişikîne. Tiştekî ku Kurd bidê nîne. Jixwe rasteqîna gelekî ku hatiye bêdengkirin, her wiha sazî, vîyan û berjewendîyekî ku karibe pêşkeş bike jî nîne.

Ji ber ku rewşenbîr hindek burjûvayê piçûk e, li benda berjewendîyê dimîne. Ew jî di Kurdan de nîne. Sazîyeke ku karibe bi Kurdistanê ve têkildar berjewendîyê pêşkeş bike nîne. Ji ber vê yekê rewşenbîr ji vir direve û ji wan ezbenîyên xwe yên ku dilsozê wan e, hetanî dawîyê xizmetê dike. Ji ber vê yekê, li ser bingehê rastîna welatê me, qalkirina ronahîbûnekê pir zor e. Ger bibe, dê bi şêwaza şoreşgerî be û her tiştî bigire berçav. Jixwe yên ku vê dikin, em in ku hindek di zemînê şoreşgerî de bi rê ve diçin.

Ên ku weke rewşenbîr xwe dihesibînin, ji gihandina rastîna gel wêdetir, di hundirê nêvengeke bêtalox de ne ku, di radeyeke dawî de hatine çelexwarîkirin û ji çavên dil û ramanê hatine pêmenkirin. Demagojîk in û ji ber ku pêwendîya zimanê wan bi rastînan re tune ye, vê metirsîyê zêdetir dike. Lê zimanê wî rewşenbîrê ku pêwendîya xwe bi rastînê re tune ye; barkêşê nexweşîyên jîrekatî û giyanî ye û weke ku tê hizirkirin jê zêditir pêwîstî bi hilkolînê heye.

Di me de ku hestên pîroz pêş nakevin, takekes û her ku diçe rastîna civakê dernakeve rastê, têkilîya xwe bi vê rewişta (karekter) rewşenbîr ve heye û ev şûngeha rewşenbîr ku li ser navê dijmin barkêş, xapînok û çelexwarî ye, pirsgirêkeke mezin çêdike.

Şêwaza birêxistina şoreşa me; dê di destpêkê de hindek xizan, gundî, şivan, kedkar û tuwêjên (kesim) civakê yên dîtir bi hilberînê re dahûrîne û dora dawî were rewşenbîr. Lê di vir de pêşketineke berevajî mijara gotinê ye. Rewşenbîr, ji ber ku yê herî di pêş de tayê berjewendîyên xwe pêş dixîne, hindek rewşengerîya xwe di destê yekem de bi sazîyên mêtîngerîyê ve girê dide, vê bi dexesîyê dike û ji ber ku vir weke yekane çavkanîya jîyanê dibîne.

Berîya ku romana Kurd were nivîsandin, dê were jîyandin.

Ger jîyîneke tirsnak pêk neyê, di me de nivîsandina romanê ne gengaz e. Bi vî alîyê xwe ve, bi gor pêvajoyên şoreşgerî yên weke şoreşa Firansî û şoreşa Rûsî şûngeheke xwe ya berevajî heye. Ew şoreş girêdayî ronahîbûneke çend sed salan û dahûrandineke (tehlîl) teorîk e. Di şoreşa Firansî de çerxa ronahîbûna bijare û bi bêrîya wê jî ronesans heye. Dîsa nifşa wêjevanên mezintirîn mijara gotinê ye. Ew teyisîna şoreşê ya di demeke kurt de, weke pratîkî hatiye dahûrandin. Lê xwe dispêre zemîneke pir xurt. Zemîna dîrokî, civakî û rewşenbîrî pir xurt e. Bi çend serhildanan encamên pratîk tên wergirtin. Şoreşa Rûs jî xwedî taybetmendîyên cihêwaz in. Hema bibêje berîya sedsalê xwedî amadekarî û nifşê wêjevan ên mezintirîn e. Dema ku Çernîşevskî dahûrandina yekem a feodalî û koletîyê da çêkirin, Lenîn jî tê de, hemû wêjevanên Rûs ev weke palpiştîya herî mezin dîtin.

civakan vedikole, dîroka wê dîroknas vedikolin, sîyaseta wê sîyasetmedar û zanistîyên sîyasî vedikolin. Lê takekes bi xwe jî ji hêla wêjeyê ve tê vekolandin. Lê mixabin, di nava me de nehatiye lêkolînkirin; êş û dilşadî nehatine nirxandin û takekes di hundirê tenêtîyeke nayê bawerkirin, her wiha bêşîyarbûnî, bêbawerî, bêewleyî, tirs, endîşe û bêhêvîyê de ye, ji her alîyê ve hêza jîyînê wenda kiriye û dişibe çivîkeke ku per û baskên wê hatine şikênandin û ne dîyar e ka dê bi kû derê ve biterike.

A ku ez dikim, hindek perpitandina vê ye, ger hindek gengaz be bibaskbûn û gengaz be derbasbûna firînê ye.

Rewşenbîrên me yên ku xwe sipartine rastîya civakê nînin.

Her ku ji rasteqîna civakî dûr dibin, ber bi zemînê neteweya serdest ve dişemitin û wisa rewşengerî pêk tê. Ji bo bûyîna rewşenbîrî, behremendîya şoreşgerî ya rastîn pêwîst dike.

Ger ji hemû alîyan ve bi rasteqîna civak, gel û pergala civaka xwe tê bigihîje, ev yek bi xwe re pêwîst dike ku pergala zilma pir giran bibîne, vebikole û hilbikole. Ev jî têr nake, ji ber ku bi hemû alîyan ve danûstandina henase girtina civakê asteng dike, divê bertekê li hemberê raber bike. Ev jî ji alîyê zagonan de, li ba me tê wateya tawanbarîyeke mezin. Heta heger rewşenbîr dixwaze pêş ve here , neçar e ku v zemînê terk bike. Zagon, hemû sazîyên wê, ya herî girîng jî hêzên ewlekarîya wê fersend nadin ku rewşenbîr gotineke piçûcik jî bike û wî tînin ber xala "vê nêvengê terk bike!" Ya yek-du gotinan dibêje, yan jî nabêje. Ger bibêje jî, pir çelexwarî, diqewêre û hindek bi gora pergalê dibêje. Encam, rasteqîna me dîsa di cihê xwe de dimîne.

Her wiha ger em ji bo xwe qala ronahîbûn û rewşenbirîyê bikin, pêwîst e ku çonayetîyeke wî ya şoreşvanîyê hebe.

Ger hatina halê takekesê serhildêr pêk neyê, mirov nikare bibe rewşenbîr.

Mînak em dikarin Îsmaîl Beşikçî, tevî ku ne Kurd e, weke rewşenbîrekî Kurdistanê binirxînin. Xwest ku li gor rasteqîna me ya civakî hindek azad birame. Bi rastî jî xwest ku di vê zemînê de birame.

Va, li rastê ye.

Rewşenbîr, di nav me de kom û tuwêja civakî ya herî metirsîdar diderbirîne.

Tê wateya takekesê ku wijdana xwe pir erzan firotiye. Ez ji vê re di wateya rastîn de nabêjim rewşenbîr, dibêjim ê sexte ango "rewşenbîrê" ku li ser navê pergala mêtîngerîyê şikestiye. Lewma ev tîp rewşenbîr êşê ranabihîse, îro ji hêzên hevkarmend jî wêdetir, mirovê vala ye.

Vala...

Di bilêvkirina rastînê de vala ye. Lê civak bêzanebûn hiştin pir metirsîdar e. Di hundirê hevkarmendîya jîrêkatîyî de ye. Warê jîrekatîyî û gîyanî jahrî dike, bêyî ku pê bihese, destekeke mezin berpêşî temsîlkarên pergala zilmê dike. Pêwîstî heye ku rewşenbîr, bi vî rengî tûşî rexneyê bê kirin.

Sedemeke vê jî, di bingeh de rewşenbîr berjewendîyên xwe di

Bilindbûyîn



Abdulla Ocelan

Ger em ji bo xwe qala ronahîbûn û rewşenbirîyê bikin, pêwîst e ku çonayetîyeke wî ya şoreşvanîyê hebe..

Analîzên hizrî

Jîyîn...

Rasteqîna civakî, mirovên ku hindek xwedî hiş in qet nade jîyandin. Tu rasteqînên civakî bi qasî ya me takekesê naperçiqînin, di nava êşan de nahêlin û di nava nabosên mezin de nadine girtin. Va, em izdirab û tenêtiya vê ya mezin dijîn.

A ku ez dikim, ji rizîbûnê wêdetir, di bingeh de qêrîna wê civak û wî takekesî ye ku îdîaya xwe wenda kirine; vîyana xwe him fermî û him jî bi kiryarî veder kirine û di nava êş û tenêtîya mezin de ne.

Di bingeh de li hember civakê ev rasteqîna serhildanê ye.

Di rasteqîna me de ji bo takekes her tişt ewqas neyînî ye ku, mirov nikare qala çi mafê takekesî bike. Ev tam jî karê wêje û rewşenbîran e. Zanist

herî berbiçav ên Ewrupî wergerandin û veguheztin zimanên xwe û di vejandin û pêşvexistina wêjeya gelên Rojhilata Navîn de gavek bi bandor avêtin.

Hêjayî gotinê ye ku heger wergera ramanên zanistî û çandî di warê pratîkî de ne xwedî bandor û geşedaneke erênî be, ew ê di pêşveçûna zanistî û şaristanî de bê encam be.

Di dema niha de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di milê wergera di navbera zimanên fermî(Kurdî, Erebî, Suryanî) de lawazî û qelsî heye, her wiha di navbera van zimanan û zimanên rojhilata navîn mîna Farisî, Tirkî, Ermenî...hwd û di navbera zimanên cîhanî yên xwedî bandor de jî lawazî hey. Wergerên nivîskar, ramanwer û zanyarên navdar ên cîhanê pir kêm peyda dibin, û sedema vê nebûna navendên werger û wergêrên jêhatî yên ji hêla wêjeyî û zanistî ve ye, her wiha guhdana û teşwîqa ji bo wergerê jî kêm e. Lewma bandorê li pêşveçûna zanistî û wêjeyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike.

Ji bo pêşketina tevgera wergera wêjeyî û zanistî, pêwîst e alîyên têkildar ên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê gavne mezin di vî milî de bavêjin, ew jî bi rêya zêdekirina navendên wegerandinê û pêşxistina navendên heyî, di hêla aborî û manewî de, her wisa avakirina navendên pêşketî ji bo fêrkirina zimanan, şandina şandeyên zanistî ji bo zanîngehên navneteweyî, da ku pisporî û zanista pêwîst ji bo wergerê bidestbixin û pêdiviyên wergerê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk bînin. Ji alîyekî din ve, divê dezgehên ragihandinê, zanîngeh û akademî, girîngiyê bidin vê zanistê.

Ji ber girîngîya wergerê û rola wê ya mezin di pêşketina zanistî û çandî û dewlemendîya miletan de, desteya sernivîskar a kovara "Şarmola" ev mijar ji bo hejmara heştemîn weke dosyaya hejmarê destnîşan kir. Her wiha Di vê hejmarê de gelek mijar, lêkolîn û nivîsên wêjeyî yên curbecur hene. Bi hêvîya ku xwîner sûdekê ji wan werbigrin.

wan ser çanda alîyê ku jê re tê wergerandin hebe.

Rêbazên wergerandinê li gor awayên wêjeyî û zanistî yên cuda cuda ne. Berhemên zanistî yên mîna bîrkarî, bijîşkî, fîzîk, kîmya û erdnîgariyê, di wergerandinê de pêdivî bi rastbûn û objektîfbûnê heye, bêyî ku destwerdana hestan tê de hebe û naskirna wergêr bi têgeh û termên zanistî hebe, ev ji bo hemû lêkolîn û gotarên zanistî jî derbasdar e. Ji bo hin cureyên wêjeyî, mîna roman, çîrok û helbestê, hewcedarîya wan bi naskirina teknîk, rewanbêjî û hunerên form û celebên wêjeyî heye, her wisa pêwîst e wergêr xwedan şiyaneke mezin be ji bo xweşikbûn û estetîka nivîsê derxîne holê, ew jî bi rêya bikaranîna bêje û ristên guncan li gor ên ku di metna orjînal de hene, da ku bandor li asta nivîsa ku tê wergerand neb.

Bi rêya "wergerê" nirxê zanist û zanyaran di Serdema Navîn de li Rojhilata Navîn bilind bû, nemaze di serdema Ebbasîyan de, "Mensur, Harûn El-Raşîd, al-Mamûn....û hwd" ên ku ji bo wergerandina zanist, zanîn û felsefeya Grîkan teşwîq dikirin û bi vî rengî, di hemû zanistan de ronesansek pêş xistin. Nivîskar û wergêrên Suryanî wê demê di tevgera wergerandinê de "ji Latînî û Grîkî bo Erebî" roleke berbiçav lîstin. Wergera ji wêjeya Farisî bo Erebî bandor li ser rastîya wêjeya wê demê jî kir.

Ewrupîyan jî di wergerandina zanyarî, felsefe û wêjeyê de ronesanseke wêjeyî û zanistî pêk anîn, ku heta niha bandora wê li tevahîya dunyayê heye.

Werger, di sedsala nozdehan de, piştî sedsalên paşverûtîya serdema dagirkerîya Osmanî (Tirk) de, roleke mezin di vejandina gelên Rojhilata Navîn (Ereb, Kurd, Suryan, Ermenî û yên din) lîstîye. Faktora herî berbiçav a ku di vî milî de xwedî rol bû, danûstandin û têkilîyên hin ronakbîran bi çanda gelên Ewrupayî re bû, ku bi rêya şandeyên Ewrupî yên ku dihatin herêmê pêk dihat. Di encama van tekilîyên çandî de, ronakbîrên gelên deverê berhemên fikrî, wêjeyî û zanistî yên

Pêşekî

Werger ... Parastin û pêşkeftina şaristanîya mirovahîyê ye

Desteya sernivîskariyê

Xweş tê zanîn ku “werger” di dewlemendkirina çandên neteweyan, nêzîkbûna gelan, pêşxistina zanînê û di ronesansa şaristanîya tevahîya mirovahîyê de, roleke mezin dilîze.

Werger zanist û huner e, xwedan teknîk, rê û rêbaz e. lewma kesê Wergêr divê xwedan çandeke berfireh be, her wiha di herdu zimanên(jêder, armanc)de asta wî ya fêmkirin û têgihiştinê xurt be, û di rastîya sîyasî, civakî û çandî ya serdema ku berhem tê de hatiye afrandin de, serwext be. Berhemên ku têne wergerandin çiqas bi nirx bin ji alîyê wêjeyî û sanistî de, wê ewqasî bandora

• **Pirtûkên derketî** .....
- Firîna Bi Baskên Şkestî.. Evîna li ber siya xwedîyên alên reş .. (Lukman Polat)..... 49
- Pirtûkên derketî.. (Desteya sernivîskarîyê) 53

• **werger** .....
- Çend Wêneyên Helbestî .. (Ebbas kiyarustemî..Wergera ji Erebî: Qadir Egîd).. 57

• **Huner** .....
- Herger.. (Fatma Ehmed) 59

• **Çîrok** .....
- Erê Ez Bûm.. (Xoşman Qado) 65
- Gorkoler.. (Zîlan Hemo) 67

• **Helbest** .....
- Çerxa felek.. (Mihemed Abdulezîz) 79
- Xwîna Helbestê.. (Mehmûd Misto) 70
- Kin Bû Buhar.. (Fîxan Hîmo) 72
- Keçê de ka em biçin ..(Mihemed Welîd) 75

• **Serbest** .....
- Navenda Mezopotamya Ya Wergerê (Darwîn Darî)..... 77
- Wêje.. (Beşîrê Mele Newaf)..... 80
- Dilekî Birîndar Şikoyê Hesen .. (Occo Mahabad) 83
- Romannasî.. (Lîlav Îsa).....87
- Gundê Başemrê.. (Şerîf Mihemed- Welîd Bekir) 90

Naveroka Hejmarê

• **Pêşekî** .....
- Werger ... Parastin û pêşkeftina şaristanîya mirovahîyê ye.. (Desteya sernivîskarîyê) 5

• **Analîzên hizrî** .....
- Bilindbûyîn .. (Abdullah Ocelan) 8

• **Dosyaya hejmarê** .....
- werger.. (Aram Hesen)..... 12
- Pirsgirêka Têrmsazîyê Di Pêvajoya Wergêrana Kurdî de.. (Berzo Mehmûd)..... 15
- Bizava Wergerê li Rojavayê Kurdistanê.. (Nêçîrvan Evdilezîz)..... 26

• **Lêkolîn** .....
- Peymana Severê û Serxwebûna Kurdistanê... (Kakşar Oremar) 31

• **Hevpeyvîna hejmarê** .....
- Li gel Nivîskar û wergêr "Ebdelah Şêxo" ye (Aram Hesen) 40

• **Jin û çand** .....
- Elmas Xan…Elmasa Dengbêjîya Kurdî 1894-1974.. (Vejîna Kurd) 44
- Xwezî.. (Salîha Qasim) 48

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

ŞERMOLA

شـــرمولا

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û Serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.
-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.
-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn, girtîye.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên gîştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê gîştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Beşa hunerî:
Rêvan Yûsiv

Desteya sernivîskarîyê:
Aram Hesen
Abdullah Şikakî
Ehmed Alyûsiv
Fatma Sîdo

-Malpera kovarê:
www.shermola.net
-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com
-Telefon û whatsapp:
0998149668

-Kovar li Çapxaneya Şehîd Herekol – Dêrik tê çapkirin.
-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (1000 L.S).

Pirtûkxaneya Baxçeyê xwendinê – Qamişlo

مكتبة حديقة القراءة ـ قامشلو

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye

Hejmar: 8 Payiza 2020 z



Dosyaya Hejmarê

Bizava Wergera Wêjeyî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê

Tabloya:Henîf Hemo

Hevpeyvîna hejmarê li gel wergêr Ebdelah Şêxo ye

Peymana Severê û Serxwebûna Kurdistanê

Firîna Bı Baskên Şkestî Evîna Li Ber Siya Xwediyên Alên Reş